

“XUDÊ NEKÎR MÎRAZÊ VA HER DU AŞİQA”: XEBATEKE MÎQAYESEYÎ LÎ SER VARYANTÊN EFRÎN Û ŞİNGALÊ YÊN ARZÎ Û QENBERA BÎ KURMANCÎ

Sevim HATUN SÜRÜCÜ

Bingöl Üniversitesi, sewimhatun@gmail.com 0009-0008-9970-9242

Ömer DELİKAYA

Bingöl Üniversitesi, omerdelikayaa@gmail.com 0000-0001-6505-5107

Article Types / Makale Türü: Research Article / Araştırma Makalesi
Received / Makale Geliş Tarihi: 21/01/2026, Accepted / Kabul Tarihi: 03/03/2026
DOI: <https://doi.org/10.26791/sarkiat.1855298>

“Xudê Nekir Mirazê Va Her Du Aşîqa”: Xebateke Miqayeseyî li ser Varyantên Efrîn û Şingalê yên Arzî û Qenbera bi Kurmancî

Kurte

Ev nivîsar hewl dide bi nêrîneke miqayeseyî varyantên cuda yên destana “Arzî û Qenberê” binirxîne ku di nav xebatên li ser edebiyata kurdî ya devkî de zêde nayên zanîn. Bi vê niyetê xebat bal û dênê xwe dide sê varyantên bi têkeliya pexşan û helbestê pêkhatî yên ji herêma Efrînê û du varyantên pexşanî yên ji Şingalê ku li wir zêdetir bi navê “Qenber û Xanelerzî” nasyar e. Herwiha yekem car di vê xebatê de varyanteke nû ya destanê ji ber qeyda deng a kilamciyê Efrînê, Mecîdê Hemgulî (1922-2007) tê bernivîsandin ku di sala 2002yê de bi tevî tembûrvan Wehîd Xelîl îcra kiriye. Mecîdê Hemgulî ku di nav nerîta destanbêjî û kilambêjiya li Efrînê de perwerde bûye û gelek kilam ji hosteyên xwe rakirine, bi şêwaza xasî xwe ya estetik destan îcra kiriye. Ev xebat, herwiha bi rêya varyantên cuda urf û adetên zewacê, nakokiyên çînî û bandora normên sosyo-çandî yên li ser vegêranê dinirxîne. Nerîta kurdî ya devkî bi sedsalan e bi cihanên vegêranê yên miletên cînar re di nav danûstandineke zindî de ye. Destana Arzî û Qenber ji wekî pireke vegêranê dema ji çandekê derbasî ya din dibe bi şêwaz, ziman û çandên nû re dikeve nav veguherînên bingeîn. Ev destan di nav repertiwara hikayetên gelêrî (*halk hikâyesi*) yên tirkî de belavbûneke berfireh nîşan dide û bi ser vê yekê re jî meriv dikare koka mihtemel a wê destnîşan bike. Ji aliyê din ve, ev xebat êşkere dike ku heman vegêran di kurmancî de, li ser xeta Efrîn û Şingalê, di nava derdorên cuda yên cografî û baweriyê de çawa veguheriye du ekotîpên ji hev cuda.

Peyvên Sereke: Arzî û Qember, Efrîn, Şingal, Mecîdê Hemgulî, Destan, Kurmancî.

“Xudê Nekir Mirazê Va Her Du Aşîqa”: Kürtçe Arzu İle Kanber’in Afrin Ve Şengal Varyantlarının Karşılaştırmalı İncelenmesi

Öz

Bu çalışma, Kürt sözlü edebiyatında henüz yeterince yer bulmamış olan Arzu ile Kanber destanının farklı varyantlarını karşılaştırmalı bir şekilde incelemeyi amaçlamaktadır. Araştırma kapsamında, Afrin bölgesinde derlenen nazım-nesir karışık üç varyant ile Şengal havzasındaki Ezidiler arasında “Qenber û Xanelerzî” adıyla bilinen iki nesir varyantı incelenmektedir. Çalışma, Afrinli halk şairi Mecîdê Hemgulî’nin (1922-2007), 2002 yılında tanbur ustası Wehîd Xelîl (Vahid Halil) eşliğinde gerçekleştirdiği icraya ait ses kaydının ilk kez çözümlenerek yazıya dökülmesi ve literatüre kazandırılması bakımından özgün bir nitelik taşımaktadır. Afrin’de Kürt halk şairleri arasında yaygın olan destan ve kılâm geleneği içinde yetişen Hemgulî, ustalarından devraldığı anlatıyı bireysel icra üslubu ve estetik tercihleriyle yeniden yorumlamıştır. Bu inceleme, ayrıca farklı varyantlar üzerinden evlilik ritüellerini, sınıfsal çatışmaları ve sosyo-kültürel normların anlatıdaki izdüşümlerini ele almaktadır. Kürt sözlü geleneği yüzyıllar boyunca komşu halkların anlatı dünyalarıyla canlı bir etkileşim içerisinde olmuştur. Bu bağlamda Arzu ile Kanber destanı, bir halktan diğerine geçerken özgün icra biçimleriyle yeniden şekillenen ve kültürler arası bir anlatı köprüsü niteliği taşımaktadır. Destanın Türk halk hikâyesi repertuvarındaki geniş yayılımı göz önünde bulunduran bu çalışma anlatının tarihsel ve edebî kökenine de değinmektedir. Öte yandan çalışma, aynı anlatının Kurmancî Kürtçesinde, Afrin ve Şengal hattındaki farklı coğrafi ve inançsal çevrelerde nasıl iki farklı ekotipe dönüştüğünü ortaya koymaktadır.

Anahtar Kelimeler: Arzu ile Kamber, Afrin, Sincar, Mecîdê Hemgulî, Destan, Kurmanca.

“Xudê Nekir Mirazê Va Her Du Aşîqa”: A Comparative Study Of The Afrin And Sinjar Variants Of The Kurdish Arzi And Qenber

Abstract

This study offers a comparative analysis of the various variants of the Arzu and Kanber epic, a narrative that has yet to receive sufficient attention in Kurdish oral literature. The research examines five distinct versions: three prosimetric (mixed prose and verse) variants from the Afrin region, and two prose versions known as Qenber û Xanelerzî among the Êzîdis of the Sinjar (Şingal) basin. A significant feature of this work is the original transcription of a 2002 performance by oral poet Mecîde Hemgulî (1922-2007) accompanied by the tambour master Wehid Xelîl, marking the first time this performance has been transcribed into written form from its audio recording. Having grown up within the rich epic and kilam traditions of Afrin, Hemgulî reinterprets the narrative he inherited from his masters through his own personal style and aesthetic choices. Furthermore, this analysis explores how marriage rituals, class conflicts, and socio-cultural norms are reflected across these different variants. For centuries, the Kurdish oral tradition has existed in a vibrant exchange with the stories of neighboring cultures. In this regard, the Arzu and Kanber epic serves as an intercultural bridge, taking on new forms as it passes from one community to another. Given its wide presence in Turkish oral literature, the study also discusses the narrative's historical and literary origins. Finally, the research demonstrates how this same story evolved into two distinct ecotypes, shaped by the different geographical and religious settings found across the Afrin and Sinjar regions.

Keywords: Arzi and Qember, Afrin, Sinjar, Mecîde Hemgulî, Destan, Kurmanji.

DESTPÊK

li Çayê Xelatê berf û ba tê berf û ba tê
gerê Xudê nekir mirazê va her du aşîqa
Xudê bike mirazê hazira la va cima’etê

Mecîdê Hemgulî

Destana Arzî û Qenber¹ li ser eşqa du dilketiyan ava bûye û hem di nav kurdan de hem jî di nav tirkî de bihezî hatiye vegêran û guhdarîkirin. Ev destan herçiqas jî aliyê gelek motifên xwe ve hevpariyê li gel çanda erebî û farisî nîşan bide jî, jî ber ku çavkaniya wê berhemeke nivîskî ya kevn nîne (li gorî zanyariyên berdest) wekî Leyla û Mecnûnê belav nebûye, a ku jî nav çanda erebî derketiye (Schimmel, 2014, 131) û bûye yek ji wan vegêranên hezkirî ya dinyaya devkî û nivîskî ya mîletên misilman. Lê rastiyeke li ber çavan e ku ev vegêran (hîkaye, qiset, destan, kilam, serhatî û hwd.) di nav zimanê tirkî de zêde belav bûye û varyantên devkî û nivîskî yên bi zimanê tirkî jî vê yekê pişt-rast dikin. Li gorî ku Korkmaz (2017, 2) destnîşan dike, ev hîkaye herî zêde li Rojhilatê Anadolûyê, li Azerbeycanê û li Iraqê belav bûye. Dema meriv li ser Arzî û Qenber an jî *Arzu ile Kanber* a bi tirkî re lê dinêre, tê dîtin ku varyantên herî kevn ên belgekirî jî zimanê tirkî mane. Qeydên herî pêşîn ên vê vegêranê jî aliyê Wilhelm Radloff (1872) û Ignacz Kunos (1892) hatine tomarkirin ku van her du berhevkarên li gel *Arzu ile Kamberê* birrek hîkaye û vegêranên zimanê tirkî jî di sedsala 19em de tomar kirine (bnr. Korkmaz, 2017, 26). Herwiha digel van her du qeydên kevin ên bi tirkî bi dehan qeydên nivîskî, *taşbaskı* û devkî hene ku parek jî wan bûne babeta lêkolînan (Erdemli, 2019; Ghareeb, 2020; Korkmaz, 2017; Özdamar, 2022; Şimşek, 1987; Alptekin, 2021) û herwiha ev vegêran li sînemayê jî hatiye adaptekirin.²

Di kurdî de, sê varyantên berdest ên Efrînê, du varyant jî jî Şingalê hatine berhevkirin. Qeyda ewil a Hesên Nazî (1889-1989) ye ku dîroka tomarkirina deng ne diyar e (Jindires, 2018). Varyanta duyem a ku li ber dest jî Celîlê Celîl û Ordîxanê Celîl hatiye girtin û jî devê Evdîlqadir Hesên Nazî hatiye bernivîsandin (Celîl - Celîl, 2014). Varyanta sêyem jî ku di heman demê de babeta sereke ya vê xebatê ye, aidî Mecîdê Hemgulî ye ku ew jî dîsa jî Efrînê ye. Varyanta çarem û ya pêncem jî Şingalê hatine berhevkirin. Heta îro me tu xebateke li ser varyantên kurdî ên vê destanê bi dest nexist. Ji ber vê yekê pêwîstî bi vê vekolînê çêbû ku belavbûn, varyantên cihêreng û veguherînên di neqeba varyantan de hêlengîne. Digel vê yekê, di vê xebatê de bernivîsandina varyanta Mecîdê Hemgulî jî cih digire ku heta nika jî deng bo nivîsê nehatibû bidefterkirin. Meqsedê din a vê xebatê jî destnîşankirina erf û adetên zewacê ye ku di nav destanê de cih digirin. Ji bo pêkanîna van meqsedan, divêtî bi nêrîneke berawirdî jî heye ku meriv pê cudahî û (ne)wekheviyên varyantên kurdî baştir rabere bike. Bi rastî jî ev destan jî ber ku hinekî jî berhemeke hevpar a mehsûlê wê danûstandinê ye ku di navbera çanda kurdî û tirkî de pêk hatiye, ferqên sereke yên vegêranî, îcrakarî û rûxsarî yên *Arzu ile Kamber* û Arzî û Qenberê de û hevpariyên vegêranî yên çanda devkî di nav her du mîletan de jî hêjayî baldariyekê ne.

1. Jêderên Sereke yên Arzî û Qemberê yên bi Kurmancî

Destanên³ kurdî yên sereke li gelek deveran belav dibin. Destanên wekî Memê Alan, Dewrêşê Evdî, Salihê Naso, Xezala Mendal Axa, Siyabend û Xecê, Salih û Kejê an jî şaxên Rustemê Zal li gelek deveran tînin dîtin û heta hin jî wan di nav zar û zimanên kurdî de jî belav dibin. Meriv dikare li Serhedê, Berferatê, beriya Mêrdînê, Botan, Behdînan û li Şingalê rastî heman destanê bê ku bi tevî enstrumanên cihê û carna li ser meqamên cihê tê îcrakirin. Beramberî vê yekê hin destan jî hene ku di hewzên lokal de mane an jî bi demê re li deverên din winda bûne û tenê li hin cihan hatine îcrakirin. Bo nimûne, destana Aşîq Xerîb û Şasenem herî zêde li Behdînan, bi taybetî jî di nav êzidiyên

1 Di vê xebatê de xêra gelek kesan gihîştê me. Di serî de em dixwazin spasiya Prof. Dr. Hemin Omer Ahmad bikin ku di hûrgiliyên xwendin û fêmkirina metnên destanê de bi me re bû alîkar. Herwiha bi saya serê Yusuf Başargan me varyantên destanê yên jî Şingalê peyda kirin, mala wî ava be. Dîsa Halil Akgül temamê metna gotarê xwend û xelatiyên rênivîsê rast kirin. Herî dawî jî bo pêşniyazên wan ên biqîmet em spasiya hakemên Şarkiyatê dikin.

2 *Arzu ile Kamber*, du caran li sînemayê hatiye adaptekirin. Adaptasyona pêşîn di sala 1952yê de ji hêla derhênerê navdar Lütüfî Ömer Akad hatiye çekirin û film li Iraqê hatiye kişandin. Adaptasyona duyem jî di sala 1972yê de ji aliyê Mehmet Bozkuş ve bi senaryoya Fuat Özlüer ve hatiye amadekirin (bnr. Kızıldağ, 2023).

3 Di vê xebatê de, me bi zanebûn xwe jî nîqaşa cureyî ya li ser destan an jî hikayetên gelêrî da alî. Ji ber ku xebatên li ser van cure vegêranan û nîqaşên derheqê vê babetê de didomin, me nexwest em van nîqaşan tekrar bikin (bnr. Kaplan, 2022; Subaşı, 2024; Keskin, 2025; Boratav 2002; Gümüş, 2019; Şeneser 2009). Herwiha jî ber ku rewşa bernivîsandî ya varyanteke Arzî û Qenberê jî wekî pêvek di vê xebatê de cih digire ev yek jî qebareya gotarê fireh dikir. Lê bi giştî em di vê xebatê de têgeha “destanê” bi kar tînin ku têgeheke berbelav e di nav kurdan û mîletên din ên îranî de.

Şingalê de hatiye îcrakirin (bo qeyda vê destanê bnr. Blau, 1975). Bi heman rengî, Hesên Dêmez jî meriv dikare bibêje ku bi giştî li Berfiratê tê dîtin lê li deverên din ber çavan nakeve. Destana Arzî û Qember jî wisa diyar dibe ku eger berî vê sedsalê li deverên din winda nebibe tenê li Efrînê û derdora wê û li Şingalê û derdora wê hatiye îcrakirin. Çawa ku me li jorê jî destnîşan kir, ev destan herî zêde di nav gelê tirk-ziman de belav bûye û di nav çanda tirkî de ev vegêran bi danûstandin û têkelbûna çanda devkî û nivîskî ve gihîştîye medya, mekan û zimanên nû.

Sê varyantên berdest ên Arzî û Qemberê⁴ wisa diyar dibe ku li Efrînê derketine ku ihtimaleke mezin li deverine din ên Berfiratê jî hatiye îcrakirin. Çawa ku me li jorê jî destnîşan kiribû varyanta ewil ji aliyê Celîlê Celîl û Ordîxanê Celîl ve hatiye bernivîsandin (Celîl - Celîl, 2014, 338-354). Di nîşeya li dawîya kitabê de ku têkildarî destanê agahî tê dayîn wiha hatiye nivîsîn: “Arzî, Qember- 16-17ê meha temûza sala 1985an de li bajarê Helebê, Sûrya ji zarê dengbêj Ebdîl Qadir Hesên Nazî hatye nivîsandin. Cara pêşîn e çap dibe” (Celîl - Celîl, 2014, 631). Li gorî vê zanyariya ku Celîl raber dikin ev varyant ji devê kurê Hesên Nazî yê bi navê Evdîlqadir hatiye bernivîsandin. Ihtimal jî ber xeletiya çapê di kitabê de hem di beşa “Nivîsarnasi”yê (2014, 631) de hem jî di beşa “Kurtejiyana Zarbêja” de (2014, 637) navê Evdîlqadir Hesên Nazî derbas dibe, lêbelê di nav destanê de wêneyekî bavê Evdîlqadir, ango yê Hesên Nazî hatiye bicihkirin. Di qeyda duyem a li ber destê me de ku dîsa qeydeke deng a Hesên Nazî (Jindîres, 2018) ye ku paraleliyeke xurt heye li gel a ku Celîlan qeyd kiriye; mixabin destpêka vê qeydê kêmtir e. Qeyd di wê beşê de dest pê dibe ku li wir bersiv didin Qember û jê re bi derewan dibêjin ku Arzî miriye. Ferqên di navbera vê varyanta bi devkî û varyanta Celîlan de ji aliyê vegêranê ve hene, wate ev her du qeyd heman îcrakarî nînin. Evdîlqadir Hesên Nazî bi qasî bavê xwe destan û kilam îcra nekirine û qeydên wî yê ku tê de îcrakariyên kamil ên destanan kiriye zaf kêmtir in (bo du îcrakariyên wî, bnr. Nadîm Ado, 2023; Jindîres, 2019).

Varyanta ku dibe babeta vê xebatê ya Mecîdê Hemgulî ye (1922-2007). Ev varyant li Youtubeê hatiye barkirin û bi temamî 54 deqîqe ye. Li gorî agahiyên di teqdîma kilamê de tînin dayîn, ev qeyda sala 2002yê e ku di ber îcrakariya Mecîd re, Wehîd Xelîl (1962-) jî li tembûrê dide (ji bo îcrakariyê bnr. Tirej Afrîn, 2021). Di bernivîsariya varyanta Hemgulî de, me bi nêrîneke gişgir hereket kir û pêşgotin an jî teqdîma ku Wehîd Xelîl ji bo Mecîdê Hemgulî pêşkêş dike li destpêka qeydê nivîsî. Yanî xebardan, teqdîm û pêş-xebardanên destan û kilaman jî gelek giring in ku divê bêne tomarkirin. Ji ber vê yekê “kasê divê di çarçoveyeke giştî de wekî berhemeke sergîhayî were qebûlkirin û mia-meleyeke baldar pê re bê kirin an na hêlên giring ên performansê dengbêj û tevkariyên guhdaran ku rehendên giring ên vê çandê ne, nayên bihîstin û bidestxistin” (Delikaya, 2024, 1201). Di teqdîma Arzî û Qemberê de ewil tembûrvan Wehîd Xelîl xebere dide û li ser Arzî û Qember, şîrketa Şerqîl Ewsed a Omer Fewzî, li ser malbata navdar a aşîqan li gundê Naza û Mecîdê Hemgulî agahiyan dide:

“Ey millet! Hecî husê mi deriyê, hecî ê kê guhê xu bide ser va bandê, va kasête sala 2002ya. Em dîsa vê êvarê şeridîne li Heleb Şêra Şewitî li Hareta Eşrefiyê li ba tembûrvanê zemên, tembûrcikî kevin e. Wehîd Xelîl, Bavê Xelîl ji binyana gundê Naza ciyê aşîqa, ciyê şe’lûla, ciyê bilbila, ciyê kilamciya.

Tê bîrê mi di qezê Êfrîn da kilamê dîrokî, kilamêd kevin dînan Hesnaziye, Evdê Şe’rê Bavê Mes’ûd. Bavê Xelîl î di vê di rêkê ra derê. Ê ji bîr nekiriye. Mîvanê mine biha ye li cem in, bîrê me Mecîd, Bavê Ednên ji gundê Tilîfê ye. Ê bi dengê xu ji me ra bi Arzî Qember dê. Bi Arzî û Qember ji millet ra. Ê tiştêkî kevin kevin ji tûras da mera pelga biqulibînê, mera ê tê derxînê ma çi bûyê. Vê êvarê me ra hare dikê Şerqîl Ewsed, mi go pir di şîrîta da gotî me’rûf e di nav ‘alemê gî da. Ne bes di nav millet da, di nav kura erdiyê tev da da. Omer Fewzî, Şerqîl Ewsed lawê xu me ra hare dikê, tim şevê li xu diherimînê Firhad, bêçiyê xu li ser va cîhazina bi zanebûnê xu û bi aqilî va kimpîyûtirê ji me ra ‘eyar dikê. Teb’ên vê kimpîyûtirêd ecer derketine, ha millet!

O em î hatin. Bavê Ednan ê kê ji me ra bê çi li ser Arzî Qember. Aşîq bûn û ê eşqê bûn. Ne çîrok e millet eva. Va kilamid em disecilînin, teqrîben şîrîtkê me gihîştine qarta sî şîrîtî kevin. Ê kê vê şîrîtina bixwazê ê werê Heleb Eşrefiyê, Şerqîl Ewsed” (Pêvek 1).

Di destpêka destanê de berî ku Mecîd dest bi îcrakariya xwe bike Wehîd Xelîl di teqdîmê de agahiyên paşxaneyî dide li ser îcrakar, şîrket û vegêranê û derbarê Arzî û Qemberê de jî dibêje: “Ê bi dengê xu ji me ra bi Arzî Qember dê. Bi Arzî û Qember ji millet ra. Ê tiştêkî kevin kevin ji tûras da mera pelga biqulibînê, mera ê tê derxînê ma çi bûyê” (Pêvek 1). Herwiha dewam dike û dibêje “Bavê Ednan⁵ ê kê ji me ra bê çi li ser Arzî Qember. Aşîq bûn û ê eşqê bûn.” Ev xebardana di destpêka kilamê de bala guhdaran dikişîne û karê ku tê kirin dipesînîne. Li ser naveroka

4 Navê vê destanê herî zêde wekî “Arzî û Qember” lê carcar wekî “Şêrîn Arzî û Qember” an jî “Şêrîn Arzî û Qemberê Lawîn” derdikeve pêşberî merivan. Di destpêkê de Hemgulî destanê wekî “Şêrîn Arzî û Qember” bi nav dike. Ji aliyê guherîna navê destanê ve ferqeke mezin pêk tê li Şingalê ku navê destanê dibe “Qember û Xan Lerzî” (Xankî, 2011). Di tirkî de navê Qember wekî “Kanber” e. Ji ber ku aşîq û şairên kurd ên îcrakariya vê destanê kirine zêdetir dibêjin Arzî û Qember me jî wisa tercîh kir di vê xebatê de. Hêjayî qalkirinê ye ku birayên Celîl navê destanê wekî “Arzî, Qember” tomar kirine bêtî ku “û”yê bixin navbera her du karakterên sereke (bnr. Celîl & Celîl, 2014, 338-354). Ev awayê gotinê jî ji bo navê destanan di nav xelkê û şairan de berbelav e.

5 Bavê Ednên ji bo Mecîdê Hemgulî tê gotin li vir. Ev çandeke erebî ye, bav bi navê lawê xwe yê mezin tê binavkirin ku di nav Efrîniyan de jî ev çand belav bûye, gelek şair bi navê zarên xwe navdar bûne, bo nimûne Bavê Selah, Bavê Ehmed.

destanê jî îfadeya “Aşîq bûn û ê eşqê bûn” tam li bejn û bala Arzî û Qember tê. Bi rastî jî Arzî û Qember, vegêranek e ku li dor eşqê hatiye ristin û serboriya biêş ya du aşîqan vedigêre ku di dawiyê de nagihîjin meqsed û mirazê xwe. Piştî teqdîmê îcar Hemgulî dest bi xebardaneke biçûk dike û dibêje, “Merheba gelî guhdara, wek birê me Ebû Xelîl gotiye, kilamên turazêdê kevin ji min dixwazin ê ku xelk û alemê pira nebihistîne hîn. Ji min dixwazin vê êvarê Şêrîn Arziyê o Qember” (Pêvek 1).

Mecîd Hemgulî kêmnasbûna destanê destnîşan dike û diyar dike “ku xelk û ‘alemê pira nebihistîne hîn” (Pêvek 1). Hemgulî jî di wê ferqê de ye ku li Efrînê û derdora wê ev êdî yek ji wan kilaman e ku ber bi windabûnê ye ango kêmkirina wê îcra dîkin. Li gorî agahiyên Wehîd Xelîl ê ku di îcrakariya Arzî û Qemberê de ji bo Mecîd li tembûrê dide, ji bilî navên ku em îro dizanin çend kesên din jî “dane vê kilamê” ango ev kilam gotine.

“Arzî Qember Evdê Şe’rê distra, Hesnazî distra. Berî Hesnazî, Evdê distira Evdê Şe’rê. Mişo distra, Mişoyê Berêz wî jî dida Arzî û Qember. O Elî Tico distra (Mihemed Elî Tico) o didan Arzî Qember. Ê kevin berî vê bi sed salî, sed û pêncî salî vana distra. Paşê El Tico, Cemîl Horo sitra. Yawaş yawaş va mitribên me ê nû dighînin ew î xort, aha ew jî yek herfa jê distrên. Mecîdê Hemgulî jî me jê ra lêxist Arzî û Qember. Mecîdê Hemgulî jî sitra. Ew jî kevin e. Ewa ji Evdê Şe’rê jî Hesnazî birin. Paşê jî Baqî Xidir jî sitra” (Hevpeyvîn, Wehîd Xelîl, 2025).

Li gorî zanyariyên ku Wehîd dide birayê mezin ê Hesên Nazî yê bi navê Evdê Şerê jî ev kilam dizanibû ku ev yek ne tiştêkî seyr e, ji ber ku ji bav û kalan de ev malbat bi şairbûna xwe ve li Çiyayê Kurmênc derketine pêş û hevpariya repertiwarê her du birayan gelek zêde bû (ji bo portreyê her du birayan û mîrasa wan, bnr. Delikaya, 2025). Lêbelê îdiaya ku Mişo Bekebûr Berazî jî ev kilam dizanibû (herçiqas meriv nikaribe bi rihetî piştrast bike jî), danûstandinên şair û sazbandên vê herêmê piştrast dike. Em ji kilamên Hesên Nazî bi xwe dizanin ku wî li odeya Şehîn Beg bi tevî Mişo kilam gotiye. Jixwe çawa ku Strâuli (2021, 24) jî di xebata xwe de vê yekê tîne zimên, danûstandinên di navbera sazband û şairên vê herêmê de û istifadekirina ji repertiwarên ji hevdu berçav e.

Koma din a varyantan bi taybetî li Şingalê di nav êzidiyan de tê dîtin ku bi gelemperî bi navên “Qember û Xan Lerzî - Qember û Xanelerzî” derdikeve pêş. Di lêgerîna lîteraturê de em rastî du heb ji van varyantan hatin ku her du jî ji nav êzidiyên li Şingalê hatibûn berhevkirin. Yek ji van varyantan a bi navê “Qember û Xan Lerzî” jî aliyê Kovan ve hatiye nivîsîn ji devê Şêx Deştî Şemsanî û di kitaba bi navê *Sêdera Şêşims: Serhatî û efsane ji folklorê êzidiyan ji zardevê Şêx Deştî Şemsanî* (2011) de hatiye weşandin. Ev varyant jî aliyê nav, naverok û rûxsarê xwe ve ji yên din cuda dibe. Berovajî varyantên li Efrînê, ev varyant bi temamî pexşanî ye û tê de hîç bendek cih nagire ku bi helbestî hatibe ristin. Varyanta dawî jî ji aliyê Dr. Xelîl Cindî ve hatiye berhevkirin û di kitaba bi navê *Dastanê Hejêkîrnê ji Çiyayê Şingalê* de hatiye çapkirin. Ev metna ku Cindî (2016, 255-261) daye hevdu şeş rûpel e û bi rengekî pexşanî-helbestî hatiye vegêran. Ihtimaleke mezin zêdetir varyant li Şingalê û derdora wê peyda dibin. Ev varyant hem ji aliyê navê xwe ve, hem jî ji aliyê gelek hêmanên din ên navxweyî ve him jî varyantên li Efrînê him jî ji varyanta din a Şingalê cuda dibe. Diyar e ku du ekotîpên⁶ cuda (Efrîn û Şingal) di kurmancî de peyda bûne.⁷

2. Mecîdê Hemgulî

Mecîdê Hemgulî di sala 1922yê de li gundê Gazê ya li ser Tilifa qeza Efrînê ji dayik bûye. Gazê gundekî kevnar e li Çiyayê Kurmênc. Navê kalê Mecîd, Mihemedê Hemgulî ye, navê bavê wî Mûrad û navê diya wî Zeyneb e ku ew ji malbata Hesên Efendiyan e. Hemgulî li cem xoçeyan hînî xwendin û nivîsandinê dibe. Malbata Hemgulî malbateke dewlemend e, lê piştî demekê ji ber aloziyên siyasî yên li herêmê feqîr dibin. Hemgulî bi Zeynebê ra dizewice, ji vê zewacê sê law û pênc qîzên wan çêdibin. Mecîdê Hemgulî di dawiya emrê xwe de bi nexweşiya şekir dikeve, nexweşî lê giran dike, berê pêşîn pêçiyên lingê wî paşê jî lingê wî ji ber kaban jêdikin. Hemgulî di sala 2007ê de, di 85 saliya xwe de li Helebê bi rehma Xwedê şa dibe. Niha gora wî li Tilifê ye (Hatun Sürücü, 2024).

Mecîdê Hemgulî di çardeh-pazdeh saliya xwe de kilaman dibêje. Lewra di nav çandê qedîm û zindî de çavên xwe vedike. Li cem xalê xwe, li cemaet, şevbihêrik û dawetan hînî kilaman dibe. Hemgulî him ketiye bin tesîra xalên xwe him jî îcrakarên navdar ên herêmê Hemûş Kûrik, Evdê Şerê, Nesen Nazî, Cemîlê Evdê Kerrê û Îbrahîmê Tirko li

6 Ekotîp têgehek e ku ji aliyê Carl Wilhelm von Sydow ve ji bo folklorê hatiye pêşxistin. Sydow li hember ekola cografî û tarîxî derdikeve ku di pêkhatina nerîtê de rola merivan paşguh dike. Bi kurtî ev têgeh serboriya vegêranekê (çirok, efsane, destan û hwd.) pênasê dike ku dema ku dikeve derdoreke çandî û cografîk a nû li gorî nerît, nîrx û normên civakî vediguhêre. Dû re ev têgeh ji aliyê Lauri Honko ve hate xurtkirin û bipergalkirin wekî pêvajoyeke adaptasyonê ya pîrhatî ku tê de vegêran li gel derdora fîzîkî, avahiya nerîtê û hewcedariyên civakî li hev dike û reng û rûyê herêmî werdigire. Di vê çarçoveyê de ekotîp, ew forma domdar a vegêranekê ye ku di encama danûstandina li gel nasname û bîr û baweriyê yên herêmî de bi dest dikeve (bo vê têgehê û pêşketina wê, bnr. Hasan-Rokem, 2016)

7 Divê meriv vê yekê jî qeyd bike ku ji bilî varyantên destanê, neviyê şairê mezin Hesên Nazî, yê bi navê Ekrem Nazî meqamê “Arzî û Qember”ê wekî safî tembûr lêxistiye di çarçoveya projeya bi navê “Efrîn e, bi deng û rengê xwe dimîne” ku bi serpereştîya Arta Productionê (bnr. Arta, 2021) hatiye amadekirin.

wî tesîr kirine. Çawa ku şair û kilamciyên berî wî û hevdemên wî lê tesîr kirine, bi heman rengî wî jî tesîr li îcrakarên serdema xwe kiriye. Hemgulî di serî de li Eliyê Kapê, Cemîl Horo, Elî Tico, Bavê Selah û gelek şair û destanbêjên li herêma tesîr dike. Mecîdê Hemgulî xwedî bîreke xurt û terzeke xasî xwe ye. Repertiwara wî bi kilam û destanên dirêj û qedîm dagirtî ye û yê wêkî Hesên Alê, Dewrêşê Evdî, Memê Alan, Êsibê Şer, Eyşê Îbê, Arzî û Qember, Ezîzê Tek Mistefa, Gureşê Mêrzo, Cembelî, Delal, Salihê Naso, Melekcan/Meleknaz, Ês û Ezîz, Edla Omer Begê, Tahir Beg, Şêx Seîd, Genç Osman, Fetah Beg, Ema Hemê, Meyremê, Mihemed Emîn û hwd. strane. Piraniya kilamên Hemgulî di navbera sala 1990 û sala 2002yê de, bi saya serê şirketa plaqê ya bi navê Şerqil Ewsed hatine qeydkirin (Hatun Sürücü, 2024) qeydên wî yê kevintir hebin jî kêma in.

2.1. Behs û Babeta Arzî û Qembera Mecîdê Hemgulî

Mecîdê Hemgulî wêkî gelek kilamên din ên ji repertiwara xwe “Arzî û Qember” jî ji şairê mezin Hesên Nazî rakirîye.⁸ Digel ku wî ev “kilam” ji Hesên Nazî wergirtibe jî bi isûla çanda devkî wî gelek guhertinên vegêranî tê de çêkirine û bi xasî xwe ew îcra kiriye.

Bejnê Arziyê zirave ji heba r'izê,
Arzî ê î'êrif bû, Qember bi şor'a xist,
Arziye xa top kir, xa çe kir h'emêzê,
Wexta destê xa di h'emêzê hevdîr'a birin,
Ar bi bedenê va aşîqa k'et,
Bû mij û dûman bela bû,
Li p'êla behrê û dengizê
(Evdilqadir Hesên Nazî)

bejnê xelqê min î kîbaro ji telayînê rizê
wexta Qember bi şora dixînê xu avêt o
law ket hemêzê
Ela ar çitlemîşî bedenê her duka bû
gurê gurê vana bû
bû ava berfêk heliyan, ketine ser dengizê
li Çayê Xelatê berf û ba tê berf û ba tê
gerê Xudê nekir mirazê va her du aşîqa
Xudê bikê mirazê hazira la va cima'etê
(Mecîdê Hemgulî)

Wekî ji bendên dawî yê her du varyantan jî xuya dibe, risteyên Hemgulî dirêjtir in û tê dîtin ku zêde di bin tesîra varyanta Hesên Nazî de maye. Di ya Hesên Nazî de jî Çiyayê Xelatê û diaya dawî ya li cemaetê tê dîtin “Xudê nekir mirazê va her du aşîqa Arziyê Qember / Xudê bikê mirazê hazira yekûn tev de lê lê vê cima'etê” (Jindires, 2018). Ji ber ku koma varyantên li Efrînê giş ji heman çavkaniyê hatine û ji bilî hindek sehneyên biçûk ên pevgirêdanê û guherîna hûrgiliyan epîzodên sereke xerab nebûne, em dê li vir tenê kurteya varyanta Hemgulî pêşkêş bikin ku di pêvekê de metna kamil jî mawcûd e.⁹

Li bajarê Qedayê Hecî Mile Mehmûd û Xedîce Xanim hene. Emrê Mile Mehmûd bûye pênçî û sisê lê Xwedê tu ewlad nedane wan. Bi meqsêda ku li hecê dia bike da ku zarokê wan çêbibe bi rê dikeve. Hecî Mile Mehmûd dema li ser rêya vegera ji hecê ye ji qefîleya xwe dimîne û rastî eşîreke ereban tê û dibe mêvanê Şêxê ereban. Du jînên Şêxê ereban hene, jina biçûk diwelide di wê şeva ku Mile Mehmûd dibe mêvanê wan. Jina mezin diçe bebika hêwiya xwe hildide û dibe datîne orta deştê û cewrikekî kûçikan tîne datîne pêşiya jinikê. Jina mezin diçe cem Şêx û wî agahdar dike ku ji xanima biçûk re cewrikek bûye. Şêx li ser vê xeberê şaş û metel dimîne û gelek şerm dike. Ji ber vê bûyerê nivê şevê eşîra xwe bar dike û ji wir diçe.

Wexta ku sibe li Hecî vetê, dibîne ku ne Şêx heye ne jî eşîr. Hecî li hêştira xwe siwar dibe û diçe. Di rê de dengê

8 “Rakirina kilaman” di nav şair û kilamciyê Efrînê de îfadeyek e ku ji bo wergirtina kilaman ji hosta û şairekî din tê bikaranîn.

9 Li vir jî ber ku koma varyantên Efrînê ji yê li Şingalê cuda dibe, divê meriv gelek bi kurtî varyanteke ji vê deverê jî bide. Varyanta Şêx Deştî Şemsanî bi kurtasî bi vî rengî ye: Xoce Ehmed bazirganekî dewlemend e û zarokên wî tune ne. Rojê zarokêkî bi navê Qember li ber darekê dibîne û tîne malê. Di heman demê de jî Xwedê keçekê dide wî û navê wê dike Xan Lerzî. Her du zarok bi hev re mezin dibin û evîndarî dikeve navbera wan. Piştî mirina Xoce Ehmed, kurê xundkarê bajêr çav berdide Xan Lerzî û dixwaze wê ji xwe re bixwaze. Pîreke fêlbaz hewl dide ku bi rêya jehrîkirinê fêlbaziyan Qember û Xan Lerzî ji hev veqetîne, lê nagihîje meqsêda xwe. Qember ji neçarî diçe welatekî din û li wir di nav leşkeran de dibe serbazekî mezin. Dema vedigere, pê dihesê ku du kurên mezinê bajêr jî ber ku xwestine bi Xan Lerzî re bizewicin, mirine. Dawiyê, Qember û Xan Lerzî digihîjin hev, lê mixabin ji ber diaya ku Qember kiriye, ew jî dimire û bi vî rengî her du evîndar bi mirazê xwe şa nabin.

girîna bebikekî lê tesel dibe û ji xwe re hildide dibe mala xwe. Dema xwe digihîne malê dibîne ku xanima wî jî razaye û jê re qîzek bûye. Navê qîzikê dikin Şêrîn Arzî û navê lawik datînin Qember. Hecî, ji xanima xwe re dibêje Qember nemijîne, dibe ku rojekê qedera wan li eniya hevdu vebe. Jinên cîranan Qember dimijînin û şîrê pêz didinê. Qember dibe şeş heft salî. Hecî dimire. Qember û Arzî bi hevdu re li ber xoce ne, rih û canê wan bi hevdu re ye. Arzî dibe çardeh pazdeh salî mala Zibar Begê xwezgînî tî, Şêrîn Arzîyê dixwazin.

Arzî diçe cem Qember du nanan dike paşîlê, dibêje tu yê herî Îstanbûlê cem hikûmetê emr û fermana me bînî, heta du salan ez ê li hêviya te bimînim. Pîra cazû bi vê yekê dihesse, diçe pêşiya Qember dibêje tu bi ku derê ve diçî, Arzî miriye. Qember sê roj û sê şevan li ser tirbekê şîna Arzîyê dike û wer dizane ku ew tirba Arzîyê ye. Piştî wextekê ji wir vediqete lê dikeve halekî perîşan. Arzî jî di vê navberê da hêviyên xwe ji Qember dibire û dibêje qey li derekê miriye. Mala Zibar Begê dîsa tî xwazgîniyê Arzîyê û piştî wextekê dixwazin şeva hineyê ji wê re çêbikin. Tam şeva hinê berê Qember li bajarê Qedayê dikeve bêtî ku bizanibe ew der ku ye. Qember ji civatê pirsîyar dike bê ka ev defa kê ye. Civat jê re dibêje ku ya Şêrîn Arzîyê ye. Qember vê yekê qebûl nake û dibêje Şêrîn Arzî miriye. Civat dibîne ku aqil ne li serî ye, jê ra dibêjin, “erê erê xebera te ye”. Qember wextê diçe ber mekteba ku wan bi hevdu re xwendine, li vir hiş û aqil tê serê wî. Qember dinêre pîra cazû li pêş jin û keçan bi hevdu re diçin mala Xedîcê ku bûkê hine bikin. Qember li vir nifiran dike ji bo kesa ku destê Arzîyê hine dike û hema wê gavê agir bi bedena pîra cazû dikeve. Kesên ku dest davêjin teştê hinê ar bi wan dikeve. Sê çar kesên din ber bi bûkê ve diçin dîsa ar bi bedena wan dikeve. Zibar Beg pê derdixe ku ev tişt ji ber nifirên Qember çêdibin, emir dike ku bûkê bêtî hineyê siwar bikin.

Serê sibê dema ku dê bûkê siwar bikin, Arzî lingê xwe dike rikêba kîjan hespî wê keliyê piştê hespî dişikê. Arzî dewrêşê li ber dîwarê mektebê dibîne û jê dikeve şikê ku ew Qember be û daxwaza hespê derwêş dike. Hespê Qember tînin, Arzî lê siwar dibe. Arzî wê gavê fam dike ku Qember hîn nemiriye. Li ser Kaniya Pîngarê, Qember ji kaniyê re gîlî û gazînen xwe dibêje, erd û esman diheze, xelk li Qember dixê û wî bi sêrbaziyê sîcdar dike. Qember diçe ber dîwarê mektebê hêşiran dibarîne. Li ser nifirên Qember kî destê xwe davêje bedena Arzîyê ar bi bedena wî dikeve û bi seredorî sê kurên Zibar Begê dimirin. Pey re Arzî diçe dide pey Qember, wextê digihên hevdu ar bi bedena wan dikeve û dibin berfek, dihelin ser behrê.

Ji bo her pênc varyantên Arzî û Qember li ber çavan bînin ronkirin, di tabloya jêrê de me cih dan navê îcrakar, destan, lehengên destanê, astengker, mekan û taybetiya vegêranî ya destanê. Wekî ku di tabloyê de jî tê dîtin her sê varyantên Efrînê ji aliyê binyad û şiklî ve dişibin hevdu. Her sê vegêran pexşan-helbest tîkel in, varyanta H. Nazî û E. H. Nazî nêzî hevdu ne; lêbelê divê bê diyarkirin ku tenê destpêka varyanta Hemgulî pexşan e, qismên mayî helbestkî ye. Her du varyantên Şingalê pexşanî ne, ya Şêx Deştî Şemsanî xwerû pexşan e, lê di varyanta Hemo Hesen Bîşar Keleş de kurte-helbestek heye ku ji du rêzan pêk tê û qiset li ser diyalogan ava bûye. Herwiha ev her du varyant li gor varyantên Efrînê pir kurt in, ji aliyê binyadê ve jî cuda ne ku me di bin serenavê berawirdkirina epîzodan de bi hûrgilî behs kir.

Tablo 1. Hêmanên Sereke yê Pênc Varyantên Destanê.

Navê Îcrakar	Hesen Nazî	Evdilqadir Hesen Nazî	Mecîdê Hemgulî	Şêx Deştî Şemsanî	Hemo Hesen Bîşar Keleş
Navê Destanê	Arzî [û] Qember	Arzî [û] Qember	Şêrîn Arzî û Qember	Qember û Xan Lerzî	Qember û Xanelerzî
Serleheng	Arzî, Qember	Arzî, Qember	Arzî, Qember	Qember, Xan Lerzî	Qember û Xanelerzî
Astengker	Pîra cazû	Cazû	Pîra cazû	Pîrek sêrbend	Fexrî
Mekanê Sereke	Qeda/Qeza	Qeza	Qeda	Heleb û Bexda ¹⁰ (bazirganî)	Mûsil-Heleb-Wan (bazirganî)
Navê Cihan ên Din	Îstembûl	Stembûl	Îstembûl	-	-

¹⁰ Di varyanta Şingalê de bajarê ku serleheng lê dimîne ne diyar e. Tenê di behsa bavê Xan Lerzî de tê gotin ku bazirganek e ku di navbera Bexda û Helebê de çûnûhatinê dike.

Navê Kaniyê	Qeder Pîngar	Qeder-pîngarê	Qere Pîngar11	-	-
Taybetiya Vegê- ranî	Helbest-peşan têkel	Helbest-peşan têkel	Helbest-peşan têkel	Xwerû peşan	Exleb peşan

3. Nêrîneke Berawirdî li Epîzodên “Arzî û Qenber”ê

Epîzod di nav cureyên edebiyata devkî de û bi taybetî di nav destan û çîrokan de wekî par û beşên sereke yê serbixwe ne ku di nav vegêran, çîrok an jî performansê de cih digirin; di dewamdariya vegêranê de wekî rûdanên sereke û kiryarên giring ên karakteran di nav xwe de xwedî însicama mekan û temayê ne ku di heman demê de peyaman pêşkêş dikin. Jixwe “serhatî û vegêranên gelêrî ji rûdan û epîzodan ve li ser hev têne nijandin û rêzerûdan helqe helqe pêkve têne risandin û bi hev ra têne girêdan” (Kaplan, 2023, 132). Di nav pênc varyantên destanê de ku bi giştî li ser du komên ekotîpan parve dibin (Efrîn û Şîngal) bi giştî epîzod û rûdanên sereke yê Efrînê li ser heman xetê ne; lêbelê yê Şîngalê jî çend aliyan ve cuda ne. Di nirxandin û berawirdkirina epîzodên destanê de me varyanta Hemgulî esas girt, eger di her çar varyantên mayî de di wê epîzodê de cudatî nîşan dabe me amaje pê kir. Divê em vê yekê jî qeyd bikin ku varyanta Hesên Nazî jî ber ku ne tamam e, me ew di nav nirxandina hemû epîzodan de nekarî bi cih bikira. Vegêran li ser yazdeh epîzodan dabeş dibe û varyanta Hesên Nazî jî epîzoda heftan û pê de daxilî nirxandinê dibe.

3.1. Du Malbatên Korocax

Di varyanta M. Hemgulî û E. H. Nazî de malbata Arzî û Qenber du malbatên korocax in. Hecî Mile Mehmûd ji bo Xwedê ewladek bidê diçe hecê, dia dike. Wextê jî hecê vedigere hîn dibe ku xanima wî Xedîce xanim razaye (welidiye). Malbata Qenber malbateke ereb e. Mile Mehmûd, bavê Arzî wextê jî hecê vedigere li çolê bi tenê dimîne, li vir rastî şêxê ereba tê ku du jinên wî hene. Şêx xwedî eşîrek mezin e, zarokên wî tune ne. Şeva ku Mile Mehmûd dibe mêvanê wî zarokê wî çêdibe. Di varyantên Efrînê de “motîfa korocax” û “motîfa dia” karîger in. Malbatên lehengan korocax in, Arzî piştî dia û lavayên ji Xwedê tê dinyayê.

Di varyantên Şîngalê de Xoce Ehmed, bavê Xanelerzî korocax ango bêdunde ye. Bazirgan e, dewlemend e û di nav hevalên xwe da jî wekî yekî bi siûd tê dîtin (Xankî, 2011; Cindî, 2016). Lê derbarê malbata Qenber de tu agahî tune ye.

3.2. Jidayikbûna Lehengan

Di varyantên Efrînê de zarokên Mile Mehmûd û Xecîceyê tune ne, ji bo vê Mile Mehmûd diçe hecê, dia dike û vegeêrê dibihîze ku keçeke wan bûye (Celîl - Celîl, 2014; Pêvek 1). Qenber lawê Şêxê Ereba ye. Di destpêkê de tê dîtin zarokên Şêxê Ereba tune ne, li vegeêrê Mile Mehmûd li mala Şêx dibe mêvan. Ew şev xanima wî ya biçûk radizê, lawek jê re dibe. Lê jî ber ku hêwiya mezin ji ya biçûk diqehire lawik dibe li çolê datîne, cewrikek kûçika tîne li ber datîne ku ev motîfa guherandina zarokan bi cewrikê kuçikan di çîrokan de jî tîne dîtin (bo nimûne çîroka Gula Perîyan, bnr. Seîd, 2022, 17-30). Di varyanta E. H. Nazî de jî jina mezin lawik dibe çolê, dike nav qûmê (Celîl - Celîl, 2014, 340). Dû re vedigere cewrikê kûçika tîne, qûndax dike dide ber jinikê. Di varyanta Hemgulî de ev beş bi devkî (peşan) tê vegêran û qasî paragrafê ye, lê di varyanta E. H. Nazî de kilamkî (helbest) tê gotin û li gor a Hemgulî dirêjtir e.

Jina xa mezin ban kir, go:

-Şêx dilê min hanî, sed car hanî,

H'elala te pê sadiq, can bi canî,

Hele were, çi xîşm e, çi qezebe ji ter'e anî,

Bi cewrikekî kûç'ka girt li p'îşa şêxê e'reba danî (Celîl - Celîl, 2014, 340).

11 “Qere Pîngar” wekî peyv ihtimaleke mezin ji “Kara Pînar” tê. Ji ber ku di devoka Efrînê de berê navê Kobaniyê wekî “Ereb Pîngarê” hatiye zanîn û bikaranîn ku ev jî digihe bikaranîna dema Dewleta Osmanî ku wê hingê navê herêmê wekî “Arap Pînarî” bûye. Wate, guherîna “pînar” a bi tirkî di devoka vê deverê de dibe “pîngar”.

Wextê konê Şêxê Ereba koç dike, Mile Mehmûd jî li hêştira xwe siwar dibe bi rê dikeve, di rê de wenga wenga zarokekî dibihîze, diçe dinêre li naverasta çolê zarokekî lawîn bi tena serê xwe ye. Mile Mehmûd lawik bi xwe re dibe malê. Em têdighêjin ku her du leheng di heman wextî de dibin, heman malbat wan mezin dike.

Di her du varyantên Şingalê de ev epîzod pir kurt e, bi du-sê ferdan tê neqilkirin. Xoce Ehmed digel hevalê xwe bo bazirganiyê diçe, vegerê qumatika zarokekî dibîne. Ewîl pirs dike bê ka xwediyê zarokê kê ye, lê kes lê xwedî dernakeve. Di varyanta Şêx Deştî de Xoce Ehmed qumatikê digel xwe dibe Helebê; lêbelê, di ya H. H. B. Keleş de dibe dide dadokekê da ku bi heqdar wî xweyî bike.

3.3. Navlêkirina Lehengan

Hecî Mile Mehmûd û Xecîce Xanim navê lehengan li wan dikin. Di varyantên Efrînê de motîfa navlêkirinê berçav e. Di varyanta Hemgulî de Hecî navê her duyan jî datîne:

“Go, ya Rebî go: “Lawê min tine ne.” Go: “Wele ez ê bibim ji xu ra xudan kim vî lawî.” Lawik anî hat. Anî hat, wexta dûr e bi şora nêzîk e gihîşt mal. Helala gendî jî tê rê nabêt pê ra qîzik xu bûye. Nav li qîzikê kirin Şêrîn Arzî, nav li lêwik kirin Qember.” (Pêvek 1).

Di varyanta E. H. Nazî de Hecî navê lawikê, Xecîce Xanim jî navê keçikê lê dike. Wextê Mile Mehmûd ji hecê vedigere, Xecîce ban dikê:

Xecîcê go: -Lo, Meh'mûdo, mi zanî tî h'ecîye

Hela nuha nek'etim wê ferqêye,

Terî li cem xoce û a'lima, ewled dan dinîyaê

Bi ser sê ro'k'et gerek vê nav nemînê,

Heta ti werê, tê navikî, tê navikî lêkê,

Minî miwaqet nav li dergûşî xa kirî,

Navî xelkî minî k'îbar, şêrîn Arziye.

H'ecî go: -Lê h'elalê, nav xayî bimbarek bê, pek doxrîye,

H'ecî go, were, were, h'elalê were,

Xudê li vana danî daqim û t'im nezere,

Me'dem navî qîzikê te şêrîn Arziye,

Navî lawî min nazlî Qenbere (Celîl - Celîl, 2014, 342-343).

Di varyanta Hemgulî de, Hecî Mile Mehmûd piştî navlêkirinê ji xanima xwe re dibêje Qember¹² nemijîne, “O go: Êgsik tê vî lawikî nemêjînî, belkî teqdîr miqedere xu li eniyê hev du vebûn, memêjînî. Ê go: Bila be” (Pêvek 1). Wekî li jorê jî tê dîtin, navlêkirin di varyanta Hemgulî de kurt û pexşankî, di varyanta E. H. Nazî de helbestkî û bi hûrgilî ye. Di varyanta E. H. Nazî de her du dergûşan kert dikin. Lewra malbat naxwaze zarokan mîna xuşk û bira mezin bikin, di yekê de kert dikin û di ya din de jî Xedîce Arziyê dimijîne, Qember namijîne (Celîl - Celîl, 2014; Pêvek 1).

Di varyanta Şêx Deştî de, bi hevokekê behsa navlêkirinê dibe. Dê û bav nav li lehengan dikin. “Her di wî demî da Xwedê keçikek da xêzana wî, navê wî jî kirine Xan Lerzî û navê wê pêçolegê jî kirine Qember” (Xankî, 2011). Di varyanta H. H. B. Keleş de, derbarê navlêkirina lehengan de agahî tune, lê em fam dikin ku navê Xanelerzî dayikê, navê Qember jî dadoka wî lê kiriye. Di varyantên Şingalê de, navê lehenga jin ango Arziyê, Xan Lerzî an jî Xanelerzî ye ku ev yek jî ferqeke sereke ya varyantên vê deverê ye.

3.4. Perwerdeya Lehengan

Di her du varyantên Efrînê de dema leheng dibin şeş-heft salî, bi hevdu re diçin dibistanê. Di varyanta Hemgulî de wextê diçin mektebê tî can û rihê wan bi hevdu re ye, deqeyekê ji hevdu venaqetin, lêbelê heta çardeh-pazdeh saliya xwe ji hevdu re behsa hezkirin û evînê nakin. Di varyanta E. H. Nazî de ji roja roj de tî kerkirin, bi hevdu re diçin dibistanê û bi hevdu re mezin dibin û hezkirin di navbera wan de çêdibe (Celîl - Celîl, 2014; Pêvek 1). Di her

¹² Di varyantan de navê lehengê mêr wekî “Qember” û “Qember” bi du awayan tê gotin. Di xebata xwe de me ji bo bikaranîna giştî “Qember” tercîh kir; lê di jêgirtinan de reseniya varyantê hate parastin. Balkêş e ku li Efrînê, Hesên Nazî û lawê xwe dibêjin “Qember”, beramberî vê Hemgulî dibêje “Qember”. Di varyantên bi tirkî de jî ev cihêrengiya navê lehengê mêr tê dîtin.

du varyantan de jî mezinbûn û evîna lehengan bi du sê risteyan tê neqilkirin, ne bi teswîrên dirêj û hûrgilî. Herwiha di varyantên Şingalê de derbarê perwerdeya lehengan de agahî tune.

3.5. Destpêka Evîna Lehengan

Epîzoda evînê li ser motîfa qederê hatiye honandin, zarok di varyantên Efrîn û Şingalê de di heman wextî de tînin dinyayê. Navê wan bi hevdu re lê dîkin, bi hevdu re mezin dibin, bi hevdu re dixwînin. Meriv jê beşer dike ku Xwedê qedera wan bi hevdu re girêdaye. Di varyanta Hemgulî de diya Arziyê, Qenber namijîne. Di varyanta E. H. Nazî de jî ew tînin kertkirin. Heta ku her du dibin ciwan behsa evîna wan nayê kirin. Lê em têdigihên ku can û rihê wan bi hevdu re ne. Ne Arzî behsa hestên xwe dike, ne jî Qenber eşqa dilê xwe beyan dike. Tiştên ku çîrûska evîna wan dike agirekî gur û wan jî pê ra dişewitîne, daxwaza lawê Zibar Begê ye. Motîfa qederê û motîfa astengkirinê du motîfên sereke ne ku ji destpêkê heta dawiyê li vegêranê tesîr dîkin. Bêguman, bi piranî leheng bi awayekî tînin astengkirin, ev rêgiriya li evîna wan di epîzoda pêncem de dest pê dike, di epîzoda dawî de bi guherînê dewam dike heta ku di encamê de nahêle her du aşîq bigihên mirazên xwe.

Di varyanta Şêx Deştî de piştî ku leheng dibin bîst salî behsa evîna lehengan dibe, “Xwedê Teala eşqekî pir dijar kire navbera wan da” (Xankî, 2011). Lê berî vê gotineke Xoce Ehmed îşaretê bi evîna wan dike, “Çi caran bi gunehî bi hev re neaxivin. Dinya rojên Xwedê ne¹³ eger rojekê bibîne rizqê hev” (Xankî, 2011). Ji bilî vê wextê Xoce Ehmed qumatika sebiyê tîne malê bangî jinên derdorê dike ku bîst zarokî bimijînin. Di varyanta H. H. B. Keleş de jî derbarê evîna lehengan de tu agahî nîne, lê wekî di varyanta Deştî de, Xoce Ehmed û xanima wî vê ihtimalê li ber çavan digirin: “Ne wisa bizanid ew xuş û birêd yek in” (Cindî, 2016). Ev jî nîşan dide ku ihtimala zewaca lehengan li ber çavan girtine û li gor wê egerê ew mezin kirine.

3.6. Bi Fêl û Fêlbaziyan Dixwazin Her du Aşîqan ji Hevdu Veqetînin

Di vê epîzodê de astengêrên li pêşîya evîna her du aşîqan derdikevin pêş. Di varyanta Hemgulî de Qenber bi rê dikeve, pîra cazû diçe pêşîya wî û li pey dek û dolaban e:

“Çû pîrik ca’zûkar, nasa û kûpa çû pêşîyê go: ‘Ti ku da derê?’ Go: ‘Wele derim Istenbulê emr û fermanê xu o Şêrîn Arziyê wînim, em hevdu bibin.’ Ê go: ‘Şêrîn Arzî mir, yawrim.’ Go: ‘Çow mir?’ Go: ‘Mir.’ Bir çû ser tirba, tirba ku lê man. Go: ‘Ev tirba Şêrîn Arziyê ye.’ De rok, didu, sisê Qenber li ser tîrbê ma, ê kê tîrbê çow bikê. Hişt o bi serê bergîrê xu girt û kişand û çû.” (Pêvek 1).

Di varyanta E. H. Nazî de keçxwestin, fêl û fûtên pîra cazû û razînebûna bavê Arziyê bi hûrgilî tînin behskirin. Lawê Zibar Begê, Arziyê dibîne hiş û aqil ji serî diçe, pîra cazû dikeve navbeyna wan, diçe mala Arziyê. Ev rewş di destanê de wiha tê neqilkirin:

“(…) pîrê Xecîce Xatûn qena’et kir bê r’êş r’êş, sipî sipî. Zalim û xêrnexwaz li serî Xecîce-xatûn k’om bûn û gotin:

-Ti kê çî qîzê xa bi vî dî? Binê ji k’u hatye? Gi xêrlî ba li wê çolê nedima. Bavî xa bêlisize, dêkê xa bêlisize. Ti kê qîzê xa bi vî bêç’arî dî, qîzî te beg, wezîr dixwazin.

Wê çaxê dêk bi dilî xweşî bi Arziyê’ra deng dîkir, êşte yawrim cînsî xayî bêlisize, lawî Zibar-begê laqmeye” (Celîl - Celîl, 2014, 243-244).

Ji vê diyalogê diyar dibe ku diya Arziyê, ji ber feqîrî û bêkesiya Qenber, wî li hemberî namzedê dewlemend û bîsl kêmbûnê û naxwaze keça xwe bide wî. Herçiqas daxwaza diya Arzî û malbata Zibar Begê be jî, vegêran li vir “motîfa pîra cazû” dike navbeynkar, hemû dek û dolaban bi destê wê digêrin û paşê jî wê dike qurban, ev jî fonksiyona Bekoyê Ewan tîne bîra meriv ku di Mem û Zînê de wekî qurban hatiye hîlbijartin. Çawa ku Beko jî wekî “fîsad û bêbextekî afirandî û çêkirî” (Subaşî, 2023, 163) dikeve xizmeta vegêranê û rola xwe ya xerabiyê bi cih tîne. Di vegêranê de pîra cazû destên Arzî û Qenber ji hevdu diqetîne, malbata Hecî Mile Mehmûd û malbata Zibar Begê ku her du jî malbatên dewlemend in, bêtîr û guneh tînin nîşandan. Ji xwe Hecî Mile Mehmûd ewil ji Xecîcê re dibêje wiha nabe, me ew kert kirine; lê ew sekna wî demkî ye, di berdewamiya rêzerûdanê de xuya nake.

Herçiqas Qenber ji malê hatibe qewitandin jî pîra cazû di wê ferqê de ye ku Qenber hîn ji Arziyê omîd nebiriye. Pîrê dibîne ku bi vî rengî meqseda wê hasil nabe, îcar dixwaze Qenber bixapîne û wî jehrî bike. Bi vê daxwazê pîrê diçe cem Qenber û wî li mala xwe dike mêvan û jê re qazeke bijehr hazir dike. Li wir Qenber jê ra dibêje bêtîr Arziyê

13 Ji vê gotina qalibî tê dîtin ku destan di nav êzidiyan de bi hin hêmanên dînî ve veguheriye. “Dinya rojên Xwedê ne” qalibekî destpêkî ya berbelav e ku di nav vegêranên êzidiyan de zaf caran tê dîtin. Zehmet e ku meriv vî qalibî di nav destan û çîrokên kurdên misilman de bibîne. Ev jî nîşan dide ku ev hikaye û destan di nav êzidiyan de hindek taybetiyên vegêranî wergirtiye ku xasî civata êzidî ye.

di ber min re naçe, li ser vê pîra cazû qazê dixê nava nan û dixê paşîla Qenber û wî bi rê dike. Qenber diçe nav bexçe li cem Arziyê û jê re behsa serhatiya xwe ya bi pîrê re dike. Arzi li ser kirinên pîrê dikeve şikê û ji Qenber re eşkere dike ku tu kesê wî li bajarê Qezayê nîne. Bi vî rengî ew tîne Qenber ji jehrîbûnê xilas dike:

“-Hela wîne em bixun.

Qenber dîtîne p’îşê xa û Arziyê. Qenber gi dest avête nê, vêr’a Arziyê dest li desta xist, ji dest Qenber pekîya. Wê daxê p’îsik ji jorde ji ser darêde dak’et û devî xa kir wê qazê gi zihêrê t’erbiya bûyî, ber’înî k’et p’îsyê vêr’a mir. Arziyê go:

-Zalim, t’u kesî me t’îne li bajarê Qezayê, ez tenê dosta teme. Go, tî her’î amanê xa li bajarî Stenbûlê me’lûmî dewletî E’l Osmên kî” (Celîl - Celîl, 2014, 344).

Di varyanta Şêx Deştî de pîrê, ewil goştê pêz ê bijehr dide Qenber lê plana pîrê naçe serî. Pîrê, piştî çendekê îcar diçe şîrê jinikekê tîne û dide Qenber da ku vexwe. Xan Lerzî, Qenber hişyar dike, dibêje, “Qenbero, venexwe, eger te vexwar dê bêjît hûn bûne xuşk û birayê hev çunkî ew şîr yê jinikekê ye, min şîrê wê vexwarîye” (Xankî, 2011). Di varyanta H. H. B. Keleş de dê û bavê Xanelerzîyê berî ku wan bizewicînin dimirin. Îcar wekî motîfa astengêr kurmamê Xanelerzîyê Fexrî di vir de rola pîra cazû digêre. Fesad û neyar, hişê Fexrî tîjî dikin ku Xanelerzîyê nede Qenber:

“Malmîrat! Ewî hanî yekê ji çolêkê anî û keçmama te ye yeka weke wê spehî tune ye, tu çilo didêyî yekî mirovek nizane ji ku va hatiye kurê kê ye? Fesada ev gotin û şîred di sêrî kirin. Ew bi xu jî nefesa Beko ‘Ewane ketiye ber’ (Cindî, 2016).

Di varyantên Efrînê de “motîfa şîr” tune ye. Herwiha ji bilî varyanta H. H. B. Keleş di her çar varyantên din de ji bo rola astengêr navê Beko nayê hildan.

3.7. Arzi Berê Qenber Dide Xerîbiyê

Di varyantên Efrînê de Arzi ji bo alîkariyê Qenber dişîne xerîbiyê. Di varyanta Hemgulî de rewş bi hûrgilî nayê teswîrkirin:

“Hatîn Şêrîn Arzi xwastin, dêykê soz dayê, rihel û bazarlix kirin, der kirin. Go: ‘Ez mêra nakim.’ Go: ‘Di sala ez kê bisebirim.’ Şêrîn Arziyê were, Qemberê lawîn di nan kirin paşilê, go: ‘Tê ber vê xu biftîlîni bajarê Istenbulê, herî cem hukmetê, emr û fermanê min û xu va wûnê, em ê hevdu bibin’ (Pêvek 1).

Arzi ji Qenber re dibêje heta du salan ew dê li hêviya wî bisebire. Di varyanta H. Nazî û E. H. Nazî de, Arzi berê Qenber dide xerîbiyê da ku here ji dewleta Elî Osman alîkariyê bixwaze û jê re dibêje ew dê heft mehan li hêviya wî bisekine.

Di varyanta Şêx Deştî de Qenber fam dike ku dek û dolabên li ser wî û Xan Lerzîyê tîne gerandin her ku diçe zêde dibin, derfetekê dibîne û diçe welatekî din. Li wî welatî di nav eskeran de dibe desthilat û paşê vedigere. Di varyanta H. H. B. Keleş de ev epîzod tune ye. Di navbera vegêrana Şêx Deştî û varyantên Efrînê de ji aliyê xêzkirina portreya Qenber ve ferqeke mezin derdikeve pêş. Di vê varyantê de Qenber realîst û serwest e, haya wî ji fêl û fûtên mala xundkar heye ku bi destê pîra sêrbaz birêve dibin, “...çunkî ew dizanît ew pîlanên kurê xundkar in, vêca hewl da ku bibite serbazekî mezin û heyfa xwe jê helînît” (Xankî, 2011). Di varyantên Efrînê de Qenber wekî lehengekî romantîk, melankolîk, dîn û pasîf tê nîşandan, ji rastiye dîr e ku ne ji Arziyê be, nikare xwe xilas bike. Ji xwe Arzi di varyantan de bi “motîfa jina aqilmend” derdikeve pêş. Ji Qenber re dibe palpişt, wî ji jehrîbûnê xilas dike, rê nîşanî wî dide û nahêle ew bikeve nav dek û dolabên dayik, malbata Zibar Begê, xundkar û pîra cazû. Arzi, her cara ku Qenber dikeve tengasiyê wekî rêber serederiyê bi rewşa aloz re dike û wî xilas dike.

3.8. Qenber ji Xerîbiyê Vedigere

Di varyanta Hemgulî de ev qisim devkî (pexşan) û kurt e. Arzi du nanan dike paxîla Qenber û wî dişîne Stenbolê, “Şêrîn Arziyê were, Qemberê lawîn di nan kirin paşilê, go, “Ti yê ber vê xu biftîlîni bajarê Istenbulê, herî cem hukmetê, emr û fermanê min û xu va wûnê, em ê hevdu bibin” (Pêvek 1). Di varyanta E. H. Nazî de, Qenber diçe cem dewleta E’l Osman, dibêje, “Dewletim, gi mera bi hevra çû mek’t’ebê û ber xoce xwestekê mina hîjde sala dergûşê me li kêrt û xera be, mala zalima ê kê bi destî zorê xwestekê min a hîjde sala ji min bistînin” (Celîl - Celîl, 2014, 347). Li ser vê, dewlet eskeran dixê bin emirê Qenber, ferman dike ku girtin û berdane hemû bi destê Qenber be. Qenber digel eskeran tê Qezayê, pîra cazû dema ku pê dihesê pêşiyê li wan digire û dibêje ev sê roj e Arzi miriye. Di varyanta H. Nazî de Qenber şeva dawetê tê bajarê Qezê.

Di varyanta Şêx Deştî de, Qenber digel komeke eskeran vedigere û li nêzî bajarê ku xundkar tê de ye, konên xwe

vedigirin. Xundkar dibîne Qenber vegeriyaye, ji hêza wî ditirse, li çareyekê digere. Li vir motîfa pîra cazû cardin derdikeve pêş. Pîra cazû, hewl dide bi dek û dolaban Qenber ji bajêr dûr bixe, radibe hinek xwarin amade dike û diçe cem Qenber, dibêje “Ez dizanim tu û Xan Lerzî gelek hez ji hev dikin, min divêt bêjime te Xan Lerzî wa mirî, û eve jî xêra wê ye!” (Xankî, 2011). Di varyanta H. H. B. Keleş de ev epîzod tune ye.

3.9. Qenber Hîn Dibe ku Arzî Sax e

Piştî ku pîra cazû Qenber dixapîne û ji bajarê Qedayê dûr dixê, Qenber bi çol û kerbelayan dikeve. Hiş û aqil ji serî diçe. Di varyanta Hemgulî de halê wî yê sefil û şerpeze wiha tê teswîrkirin, “Di sala Qenberê lawîn geriya. Sêfil, zehmet, yoxsil, yoxsirliq, tî, birçî. Kinc lê neman, ri dirêj bû, dirnax dirêj bûn, digêrê. Be’ê di sala bi şûn da Arziyê omidi birî kê Qember mir” (Pêvek 1). Piştî ku du sal di ser re derbas dibin, Arzî difikire ku Qenber miriye û zewaca bi lawê Zibar Begê re qebûl dike. Tam wextê ku def û zirne lê dixin, daweta Arziyê dest pê dike. Qenber digihe bajarê Qezayê. Qenber ji xelkê herêmê pirs dike ku ev dawet a kê ye, jê re dibêjin a Şêrîn Arzî û lawê Zibar Begê ye. Qenber ji wan re dibêje Arzî mir, mirovên cemaetê li cil û bergê wî, halê wî yê şerpeze dinêrin, difikirin ku ew dîn e û jê ra dibêjin belê miriye. Qenber ji cemaetê vediqete û diçe:

“Tesaduf di ber hucra mekteba ku tê da dixwendin wî o Şêrîn Arziyê hey ha aqil hat sêri! Go: ‘Ecêba bajarê din Qedayê hebin, ‘ecêb Şêrîn Arzî navê qîzina bûkina hebê. Wele mekteba ku me lê dixwand hev bû. Mala Hecî Mile Mehmûd hev e.’ Aqil hat sêri, aqil hat sêri. De li ber dîwarê hucrê o mektebê, bi serê bergîrê xu girtiyê, hur hur hur bi ser xu da girî” (Pêvek 1).

Hicra mektebê di hîkayetê de wekî mekanê bîrê, raboriya Qember bi bîra wî dixê. Lewra di her du vegêranan de jî cihê ku hiş û aqil tê serê Qenberê dîwane ev der e. Di varyanta H. Nazî û E. H. Nazî de, Qenber wextê ji nav qelebalixê derdikeve diçe, bi tesedîfî li ber hicra mektebê disekine ku wî digel Arziyê wextekî lê xwendibû. Wextê ku aqil tê serî fam dike ku hatiye xapandin, sedema serhatîya wî hemû fêlên pîra cazû ye. Qenber destê xwe li ber Rebê alemê vedike, nifiran dike. Ji vê epîzodê bi şûn de “motîfa nifirê” karîger e. H. Nazî vî qismî bi devkî neqil dike û dibêje, “Nifirê Qenber nifirê, diayê xu dia ye” (Jindires, 2018).

Di varyanta Şêx Deştî de Qenber hîn dibe ku Xan Lerzî miriye, eskerên li gel xwe vedigerîne û ew jî diçe ser tirba Xan Lerzî. Lê wextê vedigere malê dibîne ku Xan Lerzî sax e, nemiriye. Di varyanta H. H. B. Keleş de ev epîzod tune ye.

3.10. Zewaca Arziyê bi Lawê Zibar Begê re

Di hersê varyantên Efrînê de jî epîzoda dirêjtirîn ev e, bi şeva hineya Arziyê dest pê dike. Di varyanta Hemgulî de tê dîtin ku pîra cazû ketiye pêşiya qîz û bûkan, diçin mala bavê Arziyê ku destê bûkê hine bikin. Qenber nifiran dike, nifirên wî qebûl in. Ne dikarin destê bûkê hine bikin ne jî dikarin bûkê li hespî sîwar bikin. Lewra piştî hespî jî ber nifirên Qenber, di sî û sê ciyan de dişkê. Paşê Arzî ji Qenber dikeve şikê û dibêje herin hespê dewrêşî jî min re bînin. Diçin hespê Qenber tînin, bûkê lê siwar dikin, dibin mala Zibar Begê. Di varyanta E. H. Nazî de rûdan wekî ya Hemgulî dewam dike. Qenber nifiran dike û nifirên wî qebûl dibin. Herî dawî bi nifirên Qenber hersê lawên Zibar Begê dimrin, Zibar Beg dibêje Arziyê mala min xirab kir (Celîl - Celîl, 2014). Di varyanta H. Nazî de pîra cazû avê berdide teştî hineyê, dike ku hineyê bistrê, nifirên Qenber qebûl dibin. Wextê pîrê destê xwe dirêjî teştî hineyê dike, destê wê nagihîje teştê, behrînî pê dikeve, ar bi bedenê dikeve, dibe ax û xwelî dikeve ser teştê. Zibar Beg dibêje min hezar carî ji we re got jî vê sewdayê vegerin, nifira Qenberê lawîn li pey e. Lê jê re dibêjin tu xurifiyî, aqilê te nagihê.

Di vê epîzodê de motîfa serdest motîfa nifirê û ya hespê (ji bo motîfa “hesp” bnr. Kaplan, 2025) ye, ji xêncî vê yekê “motîfa kaniya ku biziman dibe” jî di nav destanê de heye ku hêmaneke derasayî ye. Di hersê varyantên Efrînê de kanî tê zar û ziman, şahidiya Qenber dike. Qenber ji kaniyê dipirse, kanî bersivê didê. Ev bendên xebardana kaniyê bi kilamkî hatine gotin. Di varyantên Şingalê de ev epîzod tune ye.

3.11. Mirina Efsaneyî ya Her du Aşîqan

Mirina her du aşîqan di sercem varyantên berdest de bi motîfa efsaneyî encam dide. Arzî ji mala Zibar Begê derdikeve li pey Qenber diçe, her du aşîq digihên ber avê. Li vir Arzî û Qenber bi kilaman kula dilê xwe ji hevdu re dibêjin. Her du aşîq wextê digihên hevdu dibin berf, dihelin û dikevin ser behrê. Di vê epîzodê de xala mihîm ew e ku Qenber dizane nifirên wî qebûl dibin, kêliya ku bigihên hevdu wê bimirin. Ji ber ku wextê Qenber nifiran dike, nabêje “xêyrî nefîsî canê min” û bi vî rengî ew jî dikeve bin hikmê nifira xwe.

Di varyanta E. H. Nazî de wextê her du aşîq digihên hevdu, Arzî xwe diavêje hembêza Qenber, çawa ku hevdu

hembêz dikin agir bi bedena wan dikeve, dibin mij û dûman li ser behrê belav dibin. Di varyanta H. Nazî de Arzî dizane ku Qenber li ber hicra mektebê ye, li pey diçe. Lê Qenber dizane ku nifira wî qebûl e, ji Arziyê direve. Arzî sê roj û sê şevan bi piyên pêxwas li pey Qenber diçe. Qenber jê re dibêje ev qeder e. Bi vî rengî motîfa qederê ji epîzoda yekem heta epîzoda dawî xwe bi awayên cuda nîşan dide. Ev sehne di varyanta Hesên Nazî de wiha ye:

bûne mij û dûman kesk û sorê pela gulpelê

pêlê behrê oy qederê ne dengizê

lê lê gelî birano werin mino Çayê Xelatê

li serê berf û ba tê va zulmetiya va zehmetiya dinê

Xudê nekir mirazê va her du aşîqa Arziyê, Qenber

Xudê bike mirazê hazira yekûn tev da oy lê vê cim'etê (Jindires, 2018)

Di varyanta Şêx Deştî de her du aşîq digihên hevdu, ji bo wan daweteke mezin tê kirin. Ev di varyantên Efrînê de tune ye. Lêbelê wextê Qenber diçe cem Xan Lerzî dimire. Aqûbeta pîra fêlbaz ku di varyantên Efrînê de bi kuştineke trajîk tê cezakirin di vê varyantê de nayê zanîn (Cindî, 2016). Evîna Arzî û Qenber trajîk e, nagihên mirazê xwe û dimirin. Di varyantên Efrînê de sedema trajediyê karakterên astengêr in. Di varyanta Şêx Deştî de Arzî û Xan Lerzî digihên mirazê xwe, daweteke mezin dikin lê ji ber nifirên Qenber dimirin. Di hemû varyantan de her du aşîq ji ber nifirên Qenber dimirin, lê tenê di varyanta Şêx Deştî de behsa daweta wan heye.

Di varyanta H. H. B. Keleş de Qenber ji ber gotegotên fesadan bi destê Fexrî bi hovîti tê kuştin, “Rabûn dest û piyêt Qember girêdan û Fexrî ew sitriyêt dora bajêr hemû pê gêre kirin, havîtine pê dû dewara, werîsek havête bin çengêt wî û stîrî pê girê kirin. Heta bi wî halî Fexrî rabû Qember kuşt!” (Cindî, 2016). Xanelerzî jî xwe jehrî dike: “Xanelerzî çi kir? Ew jî rabû fincaneke jehrê bi ser xu da kir û xu kuşt!” (Cindî, 2016). Wekî ku tê dîtin di varyanta Keleş de mirina lehengan efsaneyî nîne, aqûbeta Fexrî nayê zanîn, dîsa ev jî ferqeke sereke ye di nav her pênc varyantan de. Sebeba wê ne nifir be jî di destanên kurdî yê wekî Tahar û Zahar, Aslî û Kerem û Aşîq Xerîb û Şasênem de jî piştî ku her du lehengên sereke yê aşîq digihêne hevdu demildest dimirin. Bo nimûne, aqûbeta Aşîq Xerîb û Şasênemê wiha tê neqilkirin: “Aşîq Xerîb çû ber derê odê. Ko çavê Şasênemê lê ket, perda dilê wê qetiya. Û Aşîq Xerîb (...) jî ji kerbê mir” (Blau, 1975, 194).

4. Rengvedanên Urf û Adetên Zewacê di Arzî û Qenber de

Di jiyana însanan de “jidayîkbûn”, “zewac” û “mîrin” sê merheleyên giring in ku ji wan her yek bandoreke mezin li jiyana dike. Di nav her çand û mîletî de ji bo van merheleyan hin urf, adet, tore, nerît, ayîn, bawerî û hwd. tên xebitandin. Di civakan de ev normên civakî yê giring bi qasî qanûnan bi tesîr û karîger in. Lewra urf, adet û nerîten di van her sê merheleyan de bi sed salan berdewam dikin û carinan miletekî ji yê din cuda dikin. Wate, mîletên ku li cografyayeke berfireh berbelav in wan bi hevdu ve girêdide, nêzî hevdu dike. Meriv dikare bibêje ku ev urf û adet peymanên nepenî ne ku miletekî bi hevdu ve girêdidin. Ev pratîkên di van merheleyên giring de karîger in ji ber ku di heman demê de çand û taybetiyên civakan berçav dikin û hêza wan a civakî nîşan didin (Şimşek, 2003, 135, 136).

Di Arzî û Qenber de bi hûrgilî nebe jî hema hema hemû merhele û hûrkariyên zewac û dawetê tên dîtin: Kertkirin, emrê zewacê yê qîz û lawan, îfadekirina daxwaza zewacê, rola navbeynkaran di qîz-xwestinê de, çûyîna xwezgîniyê, xwestin, qewldanîn, hinekirin, dawet, bînekdaşî, rakirina beyreqê, siwarkirina bûkê li hespî, peyakirina bûkê ji hespî, gerdek, mirina zava û zewaca bûkê bi birayê zavê re (zewicîna bi tiyê xwe ra) û hwd. Çawa ku diyar e ji berê de di nav kurdan de adeta kertkirinê heye. Di varyanta E. H. Nazî de tê dîtin ku Hecî ji Xecîcê re dibêje em ê Arzî û Qenber “kêrt” bikin, li ser vê: “H’ecî k’êrtek lêxist, Xecîcê du k’êrt li dergûşê xistin” (Celîl - Celîl, 2014, 343). Di varyanta M. Hemgulî de kertkirin tune, wextê Hecî Qenber tîne ji xanima xwe re dibêje nemijîne, lewra dixwaze wan paşê li hevdu mehr bike: “O go: ‘Êgîk tê vî lawîkî nemêjîni, belkî teqdîr miqederê xu li eniyê hev du vebûn, memêjîni.’ Ê go: ‘Bila be’” (Pêvek 1).

Emrê zewacê îroroj biguhere jî berê zarokên qîzî ku 14-15 salî dibûn, dihatin zewicandin. Ev adet di her du varyantan de jî aşkera ye, di varyanta E. H. Nazî de Arzî û Qenber 18 salî ne, Qenber wextê diçe ji Dewleta E’l Osmên re giliyê malbatan dike dibêje “(...) xwestekê min a hijdeh sala ji min bistînin” (Celîl - Celîl, 2014, 347). Lêbelê, di ya M. Hemgulî de biçûktir in. “Çarde pazde salî bûn, de Qemberî lawîn o Şêrîn Arziyê ji hevdu hez dikin. Yanî ê wan bise, ê kê hevdu bibin” (Pêvek 1). Tê dîtin ku wextê Arzî dibe 14-15 salî lawê Zibar Begê wê dibîne, dicibîne; li ser vê, malbat navbeynkarekê dişîne mala Hecî. Asta aborî û civakî ya her du malbatan nêzî hevdu ne. Wextê em li metnê hûr dibin, tê dîtin ku sedema herî mezin a ku destê Arzî û Qenber ji hevdu dike bêesilbûna Qenber û statûya

wî ya civakî ye. Lewra nizanin ku kî ye ji ku derê hatiye.

Bozkurt li ser vê mijarê dibêje sedema zewacên bêhevsengî çar in û wan wiha rêz dike: esl, serwet, perwerde, dîn (2007, 77). Di zewacê de unsûra yekem “esl” e. Di nav eşîran de nîşaneya esil eşîr bixwe ye; “lewra kesên ku mensûbên eşîr û qebîleyekê nînin wekî kesên bê esl tên qebûlkin” (Bozkurt, 2007, 78). Unsûra duyem a binyadî “serwet” e. Di nav eşîran de, eşîrên dewlemend xwe di ser eşîrên xizan re girtine, ev serdestî di jiyana rojane de ji xuya kiriye (Bozkurt, 2007).

Îcar wextê em bala xwe didin Arzî û Qenber, em dibînin astengêrên sereke yê li pêş zewaca wan bêeslbûn û xizaniya Qenber e. Ev unsûr di seranserê qisetê de gelek caran tê dubarekirin. Bi heman awayî “mala Zibar Begê” bi esl û dewlemendiya xwe di nav civakê de meqbûl tên dîtin. Lewra wextê Xecîce dixwaze Arziyê qanih bike, jê ra dibêje: “Dêykê go: Erê yawrim bûn di sal in tim ihtîraz ihtîraz, yawrim me’nê bûdelakî, me’nê derekî, malê Zibar Begê tengajê me ne, hevalê me ne, bi kêf in.” (Pêvek 1). Di varyanta E. H. Nazî de diya Arzî ji Hecî re dibêje, “Ti kê qîzê bi vî bêç’arê dî, qîzî te beg û wezîr dixwazin” (Celîl - Celîl, 2014, 343). Mala Zibar Begê maleke dewlemend e, “Malik Zibar Begê heye, malik xanedan e, mezin e. Ew jî ji bajarê Qedayê ne” (Pêvek 1). Di varyanta H.H.B. Keleş de dema ku emrê Qenber û Xanelerzî digihe darê zewacê, kurmamê Xanelerzî yê bi navê Fexrî derdikeve pêş. Dîsa li vir urf û adeteke giring dertê pêş ku berê di nav eşîran de hebû û heta îro jî li hin deveran hîn xurt e. Bozkurt (2007) derbarê zewaca pismam û dotmaman de dibêje, sedem çî dibe bila bibe, wextê keçxwestinê, pêşanî ya eqrebayan e. Heger ku pismam keça apê xwe bixwaze, kesekî din nikare bo wê qîzê xwezgînî biçe, pêşanî ya wî ye.

Di varyantan de berî ku xwezgînî herin mala bavê Arziyê, navbeynkarekê dişînin mala wan. Di her du varyantan de jî pîrekê tê bi diya Arziyê re xeber dide, wê qanih dike. Paşê malbat wekî xwezgînî tê, qîzê ji dê û bav dixwaze, rihe-la bûkê xeber didin, qewlê dawetê datînin: “Hatîn Şêrîn Arzî xwastin, dê kê soz dayê, rihel û bazarlîx kirin, der kirin. Go: ‘Ez mêra nakim.’ Go: ‘Di sala ez kê bisebirim’.” (Pêvek 1). Arzî ewil qebûl nake, malbata Zibar Begê destevala vedigere lê paşê bi dek û dolabên pîra cazû re Arzî qanih dibe û ji diya xwe re dibêje bila werin:

“Xeber dan mala Zibar Begê, bêraq vena, bû gumbirtiya defê. Bû gumbirtiya defê efendim soleyim, de heftak derbaz bû. Go: ‘Heftak hindik e, heftak qe nebê Şêrîn Arziyê ra yek ji lawî Zibar Begê ra.’ Heftak din jî fitilî ket şeva pêncşemê, şeva henê.” (Pêvek 1).

Weke ku tê dîtin piştî ku malbat qîza xwe dide, ji bo dawetê qewl datînin. Ev piranî ji aliyê malbata qîzê ve tê danîn ku wekî li jorê jî tê dîtin Arzî dibêje hefteyek hindik e bila du hefte be. Piştî qewl tijî dibe îcar ji bo şeva hineyê û dawetê wext tê diyarkirin, “Heftak din jî fitilî ket şeva pêncşemê, şeva henê” (Pêvek 1). Tê dîtin şeva pêncşemê ku berî roja îne ye (di nav misilmanan de bimbarekê tê qebûlkin) tê hîlbijartin.

Êvarî piştî dawetê dikin ku destê bûkê hine bikin, ya ku destê bûkê hine bike divê jineke zewicî û bextewar be:

“Efendim soleyim eva de seet ket de û yeka (11) de û didiya (12) artix ê kê werin bûkê hene kin. Bala xu dayê ca’zûkara pîrê ê ketî pêşiyê keç û bûka, kêçeliya dikê û tê. Go: ‘Hey ha! Malê zalima xirab bê’” (Pêvek 1).

Herwiha tê dîtin ku Mala Zibar Begê xilat û bexşîşeke mezin wê bide yê ku destê bûkê hine bike, “Î ê kê şêrîn Arziyê h’enekê / Xilat û bexşîşe xa giran e” (Celîl - Celîl, 2014, 349). Piştî şeva heneyê, dotira rojê xwezgînî hespekî toximê wî baş tînin ku bûkê lê siwar bikin. Di varyantên Efrînê de civata dawetê digel dahol û lîlanê tên mala bûkê, bûk li ber “bînekdaşê” disekine ku li hespî siwar bibe. Herwiha hespekî esîl dixemilînin û dikişînin ber mala bûkê, hatina wan wiha tê teswîrkirin:

Ela, Ela, li dilê mino, lo li vê kulê ye
sibe vetê li ometê sibe vetê ku ez nemînim
li Qemberê lawîn e, Ela, Ela li dinê ye
erê malê mi danî gerê xelqê kîbar ê kê hene kin
lo ê kê sîyar kin li hespê ye
gerê dikevin tewla mala Zibar Begê ku ez nemînim
hespêd di-esîla gî bi hêceta, gî bi dapîne dikşînin ber kevrê bînekdaşê ye
(Pêvek 1).

Bûkê li hespî siwar dikin, dibin mala Zibar Begê, li wê derê ji bo bûk û zava amadehî hatine kirin, li ber ser û binê textê razanê mûm û meşale hatine vexistin ku ev di varyanta Hemgulî de wiha tê teswîrkirin:

Ela, Ela, êstira bi ser xu da berdidê ye

de were mino ku ez nemînim, lawê Zibar Begê ye
kekê pirê pirê mûman û meş'ela li ber sêri li ber linga tê ye
Ela, Ela, lo ti Xudê ye
erê wextanî lawê Zibar Begê destî xu davê xelqê meqbûl
ku ez nemînim, lo li dinyê ye
Ela, Ela, wê çaxê ar çitlemîşî bedenê dibê
dibê ava berfê, bi erdê da law dihelê ye
ê lo li min li min li min Ela, law ti Xudê ye
(Pêvek 1).

Wextê ku zava bi ber bûkê ve diçe dimire, îcar xezûr bûkê venagerîne mala bavê wê, bûkê bi lawekî xwe yê din re dizewicîne ku îro jî zewaca bi tî re di nav civakê de mewcûd e. Wextê ku zava dimire bûk li birayê zavê tê mehrkirin, ev adet di varyantan de eşkere ye. Piştî ku kurê Zibar Begê dimire, bûkê li kurekî din mehr dike û herî dawî ji ber ku hersê kurên wî dimirin bûk ji malê tê derxistin.

ENCAM

“Arzî û Qenber” an jî “Qenber û Xanlerzî” desteneke kêmnas e di nav vekolînên li ser destanbêjiya kurdî de. Ev xebata ku bi nêrîneke berawirdî du komên sereke yên destanê dane ber xwe, destnîşan dike ku ev destan li du herêmên cuda, li ser du xetên dûrî hev wekî du ekotîpan derketine pêş. Li her du herêman jî ew di nav xwe de bûye xwedî şax. Di vê xebatê de hate dîtin ku li gel cudahiyan biçûk sê varyantên li Efrînê ji aliyê binyadî ve li ser heman binyadê hatine avakirin ku ew jî mihtemelen varyanta Hesên Nazî ye. Ji ber ku Evdîlqadir Hesên Nazî ji bavê xwe, Mecîdê Hemgulî jî ji hosteyê xwe Hesên Nazî destan rakirîye. Li beramberî vê yekê her du varyantên pexşan ên Şingalê ji aliyê binyadî û vegêranî ve ji yên Efrînê cuda dibin. Cudahiya vegêranî awayê îcrakariyê ye ku li Şingalê bûye çîrok û serhatiyeke kurt a pexşanî, beramberî vê li Efrînê bi dûdirêj bi tevî tembûrê tê îcrakirin. Lewra, Arzî û Qenber wekî destaneke evînî û trajîk li Efrînê bi tembûrê tê îcrakirin û xwedî meqamekî hiznî ye lê di îcrakariya varyantên Şingalê de ji helbestîbûna xwe daketine pexşanê û ihtimalake mezin ji mejî ve wekî çîrokan tê neqilîkirin. Di varyanta H. H. B. Keleş a ji Şingalê de herçiqas encam trajîk be jî qewamên seyr rûdidin. Qenber wextê hêzekê bi dest dixê, vedigere bi Xan Lerzîyê re dizewice, wekî ku vegêr û civak bixwazin kirasê trajîk ji vegêranê bikin.

Di vê xebatê de hate destnîşankirin ku Arzî û Qember ji aliyê motifan ve têr û tijî ye; kordundebûn, pîra cazû, jehrîkirin, nifir, qeder, astengkirin, jîna aqilmend, kaniya ku dipeyîve û hwd. Herwiha meriv dikare destnîşan bike ku motîfa kaniya ku dipeyîve di varyantên Efrînê de heye lê di ya Şingalê de nayê dîtin. Herwisa motîfa şîr ku di varyanta Şingalê de karîger e, di yên Efrînê de xuya nabe. Arzî û Qember di nav zimanê tirkî de gelekî berbelav e û heta niha bi tirkî dehan xebat hatine amadekirin li ser varyantên wê. Ji berbelaviya cografîk a destanê (ku lêkolînerên tirkî wekî *halk hikâyesi* bi nav dikin) meriv dikare pê derbixe ku koka vê destanê ji nav miletê tirk hatiye û ketiye zimanê kurdî. Herwiha ev destan, nîşaneyên wê bandora dualî ye ku di navbera nerîta destanên kurdî û tirkî de rûdide.

Di destanê de gelek merhele û hêmanên nerîta dawet û zewacê jî tê dîtin ên wekî kertkirin, emrê zewacê yê qîz û lawan, îfadekirina daxwaza zewacê, rola navbeynkaran di qîzxwestinê de, çûyîna xwezgîniyê, xwestin, qewldanîn, hinekirin, dawet, bînek daşî, siwarkirina bûkê li hespî, peyaxirina bûkê ji hespî, gerdek, venana beyraqê, piştî mirina zava û zewaca bûkê bi birayê zavê re û hwd. Di kurmancî de destan bûye çavkaniya rengvedana gelek erf û adetên kurdan ku îro jî hindek ji wan li kar in.

ÇAVKANÎ

- Alptekin, Ali Berat. *Halk Hikayelerinin Motif Yapısı. 11. Baskı. Ankara: Akçağ Yayınları. 2021.*
- Blau, Joyce. *Le kurde de 'Amadiya et de Djebel Sindjar: analyse linguistique, textes folkloriques, glossaires.* Paris: Klincksieck. 1975.
- Boratav, Pertev Naili. *Halk Hikayeleri ve Halk Hikayeciliği. Ankara. Türkiye Ekonomik ve Toplumsal Tarih Vakfı. 2002.*
- Bozkurt, İbrahim. *Aşiretlerde Törelere ve Aşk Savaşları. İstanbul: Tila Yayınları. 2007.*
- Celil, Ordixanê - Celil, Celilê. *Zargotina Kurda: Êpîk û Dastan 1. Vienna: Înstîtûta Kurdzanîyê – Wien. 2014.*
- Cindî, Xelil. *Dastanê Hejêkîrî ji Çiyayê Şingalê. Duhok: Spîrêz. 2016.*
- Delikaya, Ömer. “Guherbariya çanda devkî, xwedîtî û ekolojiya nerîtê: Jiyan û kilamên Evdê Şerê û Hesên Nazî”. *Şarkiyat* 17(2), (2025), 325-347. <https://doi.org/10.26791/sarkiat.1732707>
- Delikaya, Ömer. “Nû-varyanteke Mem û Zînê ya Dengbêjê Elaşgîrî Kazoyê Garîsya: Nîrxandîneke Pêwendî û Bernivîsandin”. *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 12(3), (2024), 1197–1226. <https://doi.org/10.18506/anemon.1543219>
- Delikaya, Ömer. “Şair, Dengbêj, Sazbend û Aşiq: Nêrînek li Termînolojiya Îcrakîrên Edebiyata Kurdî ya Devkî”. *Mukaddime*, 16(1), (2025), 231–261. <https://doi.org/10.19059/mukaddime.1515868>
- Erdemli, Gizem Buse. *Türk halk hikâyeleri ve halk türkülleri arasındaki ilişkiler (Anadolu sahası Köroğlu ve Arzu ile Kamber örneği).* Ankara: Hacettepe Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Yüksek Lisans Tezi, 2019.
- Ghareeb, Sarah. *Arzu ile Kamber hikâyesinin Kerkük varyantları. Erzurum: Atatürk Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Yüksek Lisans Tezi, 2020.*
- Gümüş, İbrahim. *Elif ile Mahmut Hikayesi. Hiper Yayın. İstanbul. 2019.*
- Hasan-Rokem, Galit. “Ecotypes: Theory of the lived and narrated experience”. *Narrative Culture*, 3(1), (2016), 110–137.
- Hatun Sürücü, Sevim. “Mecîdê Hemgulî: Jiyan, dengbêjî û bernivîsandina destana Mihemed Emîn (Leyla û Mecerûn)”. *Kurdiyat*, (2024), 10, 41–65. <https://doi.org/10.55118/kurdiyat.1555489>
- Hemkoçer, Mihemedê Cezawîr. *Bêrîvana Cindî: Çend Destan û Serhatiyên de vera Efrînê (Rojavayê Kurdistanê).* Silêmanî: Enstituya Kelepûrê Kurdî. 2012.
- Jindires. “Arzî û Qenber – Dengbêj Hesnazî | روائع التراث الكردي | حسننازي | Arzê û Qenber”. YouTube. 2018, January 6. <https://www.youtube.com/watch?v=yEQTySqIOZA>
- Jindires. “Lê Xanê 1995 شعره حنان عفدي بصوت سترانا خانى [Video file]”. Youtube. 3 January 2019. https://www.youtube.com/watch?v=nPzgs2_D_JU
- Kaplan, Leyla. “Kürt Destanlarındaki Sembolik Öğeler.” *Eskişehir Osmangazi Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 26(3), (2025), 1028–1043. <https://doi.org/10.17494/ogusbd.1763628>
- Kaplan, Yaşar. “Helsengandînek li ser Cûreyên Vegêranê yên di Folklorê Kurdî da (Destan, Beyt û Vegêranên Strankî)”. *International Journal of Kurdish Studies*, 8 (2), (2022), 273–292. <https://doi.org/10.21600/ijoks.1144690>
- Kaplan, Yaşar. “Ji edebiyata devkî ya Kurdî serhatiyek evînî: Salih û Kejê û deqeke çapkirî”. *Mukaddime*, 14(1), (2023), 120–146. <https://doi.org/10.19059/mukaddime.1265178>
- Keskin, Necat. “Destan û Hikayeyên Gelêrî: Nîqaş û Nîrxandînek li ser Cûreyên Edebiyata Kurdî ya Gelêrî”. *Nubihar Akademi*, 23, (2025), 101–122. <https://doi.org/10.55253/2025.nubihar.1698482>
- Kızıldağ, Hasan. “Sözden beyaz perdeye bir üslup dönüşümü: Arzu ile Kamber”. *Journal of History School (JOHS)*, 16(66), (2023), 2008–2021. <http://dx.doi.org/10.29228/Joh.71665>
- Korkmaz, Türkan. *Arzu ile Kanber hikâyesi (Milli Kütüphane nüshası 06 Mil Yz A 8618 ve Konya nüshası 42 Kon 1882/2) (İnceleme-metin-çeviri-dizin-tıpkıbasım).* İstanbul: Marmara Üniversitesi, Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü, Doktora Tezi, 2017.
- Nadim Ado. “ناز اکرم العازف عفريني تراث من حلقة”. YouTube. 2023, December 24. <https://www.youtube.com/watch?v=FK10liW6aCM>
- Öktemgil Turgut, Canan. “‘Arzu ile Kamber’den ‘Yılan Hikâyesi’ne”. *Millî Folklor*, 55, (2002), 36–41.
- Özdamar, Fazıl. “Arzu ile Kamber hikâyesinin Dudu Özdamar varyantı”. *Millî Folklor*, 17(135), (2022), 247–258.
- Schimmel, Annemarie (2014). *A two-colored brocade: The imagery of Persian poetry.* Chapel Hill, NC: University of North Carolina Press.
- Seid, Rêdî. *Gula Perîyan (Çirok, Xebroşk û Destanên Kurda).* Ankara: Wardoz. 2022.
- Sträuli, Barbara. “Dewrêşê Evdî - Dewresh, son of Evdi: A Kurmanji epic as performed by the Berazi singer Baqî Xido”. In *Dewrêşê Evdî - Dewresh, son of Evdi.* Wiesbaden: Harrassowitz Verlag, 2017.
- Sträuli, Barbara. “Our steppe is vast ...”: *Kurdish epics and tribal stories from Urfa, 1906 collected by Oskar Mann.* Wiesbaden: Harrassowitz Verlag, 2021.
- Subaşı, Kenan. “Fesad û Bêbext di Trajediya Evînê da: Weku Nimûne Destanên Evînî yên Mêjûyî”. *Mukaddime*. 14 (Özel sayı 1), (2023), 148–176. <https://doi.org/10.19059/mukaddime.1243035>
- Subaşı, Kenan. “Ji Mîtolojiyê ber bi tarîxê û ji lehengîyê ber bi evînê destan weku çemkeke siwan di vegêrana gelî da”. *Şarkiyat* (16) 1, (2024),

104-116. <https://doi.org/10.26791/sarkiat.1425264>

Şeneser, Refiye. *Adana Halk Hikayeciliği ve Halk Hikayeciliği Geleneği. Adana. Altın Koza Yayınları. 2009.*

Şimşek, Esmâ. *Arzu ile Kamber hikâyesi üzerine bir araştırma*. Elazığ: Fırat Üniversitesi, Yüksek Lisans Tezi, 1987.

Tirej Afrin. “Şêrîn Arzî û Qember شیرین آرزو و قمبر”. YouTube. 2021, December 25. <https://www.youtube.com/watch?v=cSRbcl8DEaM>

Türk Filmleri TV. *Arzu ile Kamber Türk Filmi | FULL | SEZİN SEZER | KENAN ARTUN*. YouTube. 2023, June 10. <https://www.youtube.com/watch?v=K9gPMf4F3mY>

Xankî, Kovan. *Sêdera Şêşims: Serhatî û efsane ji folklorê êzdiyan ji zardevê Şêx Deştî Şemsanî*. Enstituya Kelepûrê Kurdî: Silêmanî, 2011.

Arta. “Efrîn e | Ekrem Nazî - Arzî û Qember”. YouTube. 2021, June 24. <https://www.youtube.com/watch?v=UVw9CGzyUvg>

PÊVEK 1. Arzî û Qember a Mecîd Hemgulî ku pê re Wehîd Xelîl tembûrê dide

[*Wehîd Xelîl teqdîmê dike*]:

Ey millet! Hecî husê mi deriyê, hecî ê kê guhê xu bide ser va bandê, va kasêtê sala 2002ya. Em dîsa vê êvarê şeridîne li Heleb Şêra Şewitî li Hareta Eşrefiyê li ba tembûrvanê zemên, tembûrcîkî kevin e. Wehîd Xelîl, Bavê Xelîl ji binyana gundê Naza ciyê aşîqa, ciyê şe’lûla, ciyê bilbila, ciyê kilamciya.

Tê bîrê mi di qezê Êfrîn da kilamê dîrokî, kilamêd kevin dînan Hesnaziye Evdê Şe’rê Bavê Mes’ûd. Bavê Xelîl î di vê di rêkê ra derê. Ê ji bîr nekiriye. Mîvanê min e, biha ye li cem in, birê me Mecîd, Bavê Ednên ji gundê Tilifê ye. Ê bi dengê xu ji me ra bi Arzî Qember dê. Bi Arzî û Qember ji millet ra. Û tiştêkî kevin kevin ji tûras da mera pelga biqulibînê, mera ê tê derxînê ma çi bûyê. Vê êvarê me ra hare dikê Şerqîl Ewsed, mi go pir di şîrîta da gotî me’rûf e di nav ‘alemê gî da. Ne bes di nav millet da, di nav kura erdiyê tev da da. Omer Fewzî, Şerqîl Ewsed lawê xu me ra hare dikê, tim şevê li xu diherimînê Ferhad, bêçiyê xu li ser va cîhazina bi zanebûnê xu û bi aqilî va kimpîyûtir ji me ra ‘eyar dikê. Teb’ên vê kimpîyûtirêd ecer derketine, ha millet!

O em î hatin. Bavê Ednan ê kê ji me ra bê çi li ser Arzî Qember. Aşîq bûn û ê eşqê bûn. Ne çîrok e millet eva. Va kilamid em disecilînin, teqrîben şîrîtîkê me gihiştine arta sî şîrîtî kevin. Ê kê vê şîrîtina bixwazê ê werê Heleb Eşrefiyê, Şerqîl Ewsed. Teb’ên du mihelê merî hene him li jêr him li jor, çow li jêr çow li jor, di wêrê yekê heye, paşiyê haretê heye. O însan wek min hene, li heq ro mihîm pir rûniştine. Xêr fen ahina erzan bûye di nav milletê kurda da, de e jî nizamim. Sî û çar (34) saline li va tembûrê dixînim tembûrciyê Cemîl Horoyê rehmetî, Ebû Mes’ûdê rehmetî, Hesnaziye rehmetî, Xudê rehma xu li giştika kê. Ji de û çar saliyê da (14) heta pêncî saliyê (50) tim ez ê biwême, ez bûme bekçiyê şevê li ber va tembûrê. Ji millet ra ye, ne ji min ra ye ha, tişt ji min ra tine ye. Gî ji milletî kurd ra e dikim. O hev şîrîta ne ticaret e. Ne ticaret e. O em î hatin.

Gelî kurd! Çîçkî mi zêde deng kir kêmkasiyê însên îla ê kê hebin, qisûrê mi af kin. Qandî arta ez diqehirim, qandî e dişewitim, di hundir mala xu da.

[*Mecîdê Hemgulî dest pê dike*]:

Merheba, gelî guhdara! Wek birê me Ebû Xelîl gotî, kilamên turazî kevin ji min dixwazin ê ku xelq û ‘alemê pira nebihîstine hîn. Ji min dixwazin vê hêvarê Şêrîn Arziyê û Qember.

Şêrîn Arzî û Qember hîn tine ne. Hecî Mile Mehmûd heye, ji bajarî Qedayê. Xudê ti ewlad nedaniyê. ‘Umrê xu pêncê sê (53) sal e. Go: “Xedîce Xanim.” Go: “Em herin hecîk xu bikin.” Go: “Belkî Xudê, em ber Rebbî xu bigerin, belkî Xudê ewladîkî bi me dê.” Hecî Mile Mehmûd bervê xu fitiland hecê. De berê diçûn hecê, bi hêştira diçûn, bi deva diçûn. Makîne tune bûn, teyare tune bûn, tişt tine bûn. Şeş meha diçûn, şeş meha dihatin. Evina efendim soleyim da rê kir, çû hecê. Bi hevala ra bi rê ket çû heca xu kir. Ber Xudê xu gerî, ya Rebbî ti ewladîkî bi me dê. O fitilî. Wexta fitilî bi rê va, de hevala wan va li cîkî xew kirin, li ser ka’nîkê derekê xew kirin, efendim soleyim. Sibe da rêbû ser xu, bala xu dayê qe heval tine ne. Bi tenê mayî li wê derê.

Ê de eva, ne zanî ê kê ku da herê, ne zanî rêka mal li ku ma, ne der li ku ma. De eva li hêştirê enîşt o ‘am tam çû. Deşt ket, bi kêrbela ket. Rast eşîrik ereba hat. Rast eşîrikê hat, de malê şêx jî bêlî ye. Eva çû bin konê şêx. Silam elêkum, elêkum silam hecî baba. Li cem şêx bû mîvan. De werê şêx jî di jin xu hene. Jinê biçûk wê şevê diwelidê, jina mezin çi kir? Wexta ku welidî bi şûn da, çû cewrikî kûçka anî hat, çê kir pêşiya jînkê û qîçik ji pêşiyê rakir. Qîçik bir çû, çê kir orta deştê, kêrbelê. Efendim soleyim, hat bi mêrê xu ra go, go: “Jina te cewrikî kûçka anîye.” Go: “Aman jînkê dexîl dixul mi riswa meke nav eşîrê da, min cem vî mîvanî me, li me bûye mîvan, cem vî hecîyî.” Ê go: “Zîrar tine.” Efendim soleyim eva şev li nivê şevê şêx deng li eşîrê kir. Kekê, eşîrê gî bar kir û da rê kir çû şêx. Nan manê hecî dînan ber sêri. Parçek didu nano xurmena va dînan ber sêri, hîştin û çûn.

Wexta hîştin û çûn. Sibe li ometê vevat, li hecî vevat. Hecî bi xu hesî taw taw ne şêx heyê, ne eşîr heyê, ne kesik heyê! Ê bira Hecî Mile Mehmûd bi rê ket. Rabû li hêştirê xu nîst. Go: “Ya Ela ya Xudê meşîya.” Êpey wext meşîya, bala xu dayê dengê qîçîkî ket qulaqa, fitilî ser qîçîk, bala xu dayê lawîk. Go: “Ya Rebbî!” Go: “Lawê min tine ne.” Go: “Wele ez ê bibim ji xu ra xudan kim vî lawî.” Lawîk anî hat. Anî hat, wexta dût e bi şora nêzîke gihîşt mal. Helala gendî jî têrê nabê pê ra qîzik xu bûye. Nav li qîzikê kirin Şêrîn Arzî, nav li lêwîk kirin Qember. O go: “Êgîk tê vî lawîkî nemêjînî, belkî teqdîr miqederê xu li eniyê hev du vebûn, memêjînî.” Ê go: “Bila be.”

De va lawîka bi cîrana dimêjandin, şîrê pêz didanê, î delala didanê, mezin kirin welhasil. Mezin bûn, şeş heft salî bûn. Hecî Mile Mehmûd serê xu dîna diyarê rehmê axa gornê. ‘Umîr da we, ‘umîr ji we ra bê. Ma Şêrîn Arzî o Qember o Xedîce Xanim. Evîna şeş heft salî bûn, bi hev ra çûn mektebê. Bi hev ra derin mektebê efendime soyleyim; lê rih û canî xu bi hevdu ra ne, deqakê bê hevdu sebrê xu netê.

Çarde pazde salî bûn, de Qemberî lawîn o Şêrîn Arzîyê ji hevdu hez dîkin. Yanî ê wan bise, ê kê hevdu bibin. Malik Zibar Begê heyê, malik xanedan e, mezin e. Ew jî ji bajarê Qedayê ne. Hatin Şêrîn Arzî xwastin, dêykê soz dayê, rihel û bazarlîx kirin, der kirin. Go: “Ez mêra nakim.” Go: “Di sala ez kê bisebirim.” Şêrîn Arzîyê were, Qemberê lawîn di nan kirin paşilê, go: “Ti yê ber vê xu biftilîni bajarê Istenbulê, herî cem hukmetê, emr û fermanê min û xu va wûnê, em ê hevdu bibin.”

De Qemberê lawîn çû. Çû pîrik ca’zûkar, nasa û kûpa çû pêşîyê go: “Ti ku da derê?” Go: “Wele derim Istenbulê emr û fermanê xu o Şêrîn Arzîyê wînim, em hevdu bibin.” Ê go: “Şêrîn Arzî mir, yawrim.” Go: “Çow mir?” Go: “Mir.” Bir çû ser tîrba, tîrba ku lê man. Go: “Ev tîrba Şêrîn Arzîyê ye.” De rok, didu, sisê Qember li ser tîrbê ma, ê kê tîrbê çow bikê. Hişt o bi serê bergîrê xu girt û kişand û çû. Da rê kir çû.

Efendim soyleyim. Em serê we neyşînin. Di sala Qemberê lawîn geriya. Sêfil, zehmet, yoxsil, yoxsirliq, tî, birçî. Kinc lê neman, ri dirêj bû, dirnax dirêj bûn, digêrê. Be’dî di sala bi şûn da Arzîyê omîdî birî kê Qember mir. Çunkî go: “Heta di sala Qember nehat, nemirase ê bihata.” Omîdî birî. Go: “Mir.” Heywax Qember! Go: “Mi çi xalî li xu kir. Xêrê mi ti şandî bajarê Istenbulê, gerek mi ti neşandiba. De ku ti li kîjan çolê mir, kîjan kêrbelê mir o e jî di vê hesretê da, di vê yoqsirliqîyê da, di vê zehmetîyê da mam.” Go: “Qe nebê tîrbê te li vir ba, min bîdiya, ezê bihatama ber serî te, min ê fatihak ji te ra bixwanda.” Îlla ya Rebbî go: “Ez kê çow kim.” Bi dêykê ra go: “Xedîce Xanim, Xedîce Xanim!” Go: “Emrê we çi ye, bikin.” Go: “Îhtîrazên min neman.” Dêykê go: “Erê yawrim bûn di sal in tim îhtîraz îhtîraz, yawrim me’nê bûdelakî, me’nê derekî, malê Zibar Begê tengajê me ne, hevalê me ne, bi kêf in.” Go: “E ji te wê pîrsê nakim.” Go: “E şekalê Qember bi êl û eşîra bavîkê te î teresî Zibar Begê nadim.” Go: “Niha nesîheta li xu bikin, nesîheta mi’l [li mi] mekin.” Go: “E bi te ra dibê emrê we çi ye, bikin.”

Xeber dan mala Zibar Begê, bêraq vena, bû gumbirtiya defê. Bû gumbirtiya defê efendim soleyim, de heftak derbaz bû. Go: “Heftak hindik e, heftak qe nebê Şêrîn Arzîyê ra yek ji lawî Zibar Begê ra.” Heftak dîn jî fitilî ket şeva pêşemê, şeva henê. Qemberê lawîn bi emr û fermanê Rebbî ‘alemê şîrp danî lingê xu bi bajarê Qedayê ket, bi wir ket. Ma qey ne zanî bajarê Qedayê! Tê î serî belgîrê xu dikşînê derê. Gihîşt cima’etekî go: “Çi ye, law e va defa?” “Law def e go çi ye?” “Defa kê ye?” Go: “A Şêrîn Arzîyê o lawê Zibar Begê ye.” Go: “Şêrîn Arzî mir, yawrim mir.” [Go]: “Law nemirîye şêxê min, ku da yî, miriba xêr e, ê kê vê defê lêxin.” Go: “Mir.” Cima’etê se kir î tevlihev e, aqilî tevlihev kirîyê, eşqê kuştîyê. Go: “Erê, erê Şêrîn Arzî mir.” Ser xu de’f kirin. Gihîşt hinik dîn, dîsa pîrs kir go: “Ev çi ye?” Go: “Dawet e, çi ye law.” [Go]: “Daweta kê ye?” Go: “Daweta Şêrîn Arzîyê a lawî Zibar Begê ye.” Go: “Arzî mir yawrim mir.” Nuha go: “Dewrêş baba xêr e kê Şêrîn Arzî miriba, xêr e, ê kê li defê xin, xêr e, kê va xelq mehlûqî kom kin. Xêr e, ki va ‘alema gî kom bê.” Go: “Nemirîyê.” Yaw go: “Mir, yawrim mir, mir.” Se kirin î tevlihev e. Go: “Mir, mir here.”

Efendim soleyim eva çû. Serê bergîrê xu dikşînê o derê. Defê zanê, dohilê zanê, xelqê zanê. Î dikşînê derê, çû. Tesaduf di ber hucra mekteba ku tê da dixwendin wî o Şêrîn Arzîyê hey ha aqil hat sêrî! Go: “Ecêba bajarê dîn Qedayê hebin, ‘ecêb Şêrîn Arzî navê qîzîna, bûkîna hebê. Wele mekteba ku me lê dixwand hev bû. Mala Hecî Mile Mehmûd hev e.” Aqil hat sêrî, aqil hat sêrî. De li ber dîwarê hucrê o mektebê, bi serê bergîrê xu girtîyê, hur hur hur! Bi ser xu da, da girî.

Efendim soleyim, eva de se’et ket de û yeka (11) de û didiya (12), artix ê kê werin bûkê hene kin. Bala xu dayê ca’zûkara pîrê ê ketî pêşîyê keç û bûka, kêçeliya dikê û tê. Go: “Hey ha! Malê zalima xirab bê.” Go: “Bi mi ra gotin tema Şêrîn Arzî mir.” [*E de Qemberê lawîn kê ban kê, hele ê kê bê çi, de bila ban kê.*]

gerê Qemberê lawîn ban kir go, weylê weylê weylê lê
Ela, Ela go, li dilê mino lo li vê kulê ye
xelkê kîbar kê hene kin lo kê sîwar kin
Ela, Ela ‘eceba li canî te zor û gûc û lo qehir nêye
Ela go, dilê mino law dîlkî li yan e
erê bala xu dayê se’etê ket, de û yeka, de û diduyan e
erê balê xu dayê pîra ca’zûkar e
ketî pêşî keçan û bûkan e
dikê kêçeliya o zilqîtan e
zendê heta bi enîşkê lo vemalane
gerê ketin ku ez nemînim
hewşa Hecî Mile Mehmûdê kalo
ku ez nemînim law dinyalika bi derewane
se’etê ketin de û yeka û de û diduyan e
go Ela, Ela, dilê min dibê o law dil dibê ye
Ela, Ela, hus û dengê min î tê ye
Ela, Ela î destî xu bavê xelqî min î kîbar hene kê ye
ar çitlemîşî bedenê bê Ela, bişewitê bihelê
bi ava berfê bê bi erdê da lo bihelê yê
ê lo li min li min li min Ela, lo ti Xudê ye
[tembûr]
Qemberê lawîn digo, weylê weylê weylê lê
Ela, Ela dilê mino lo li vê kulê ye
wextanî ca’zûkara pîrê gerê ber bi bûkê derê
dest davê deştê henê ye
Ela, Ela, ar bi bedenê dikevê ku ez nemînim
dibê ava berfê lo dihelê ye
ê lo li min li min li min Ela, ti Xudê ye
çar û pêncê derine lo li wê rê ye
Ela ya Rebbî, kî bûkê hene kê
baxşîşê xu giran e, lo li dinê ye
ez nemînim, ku ez nemînim
teştê henê bûye marê reşî heneşî Qafdxî
kes newêrê nêzikî tim bibê ye
ê o li min li min li min lo
herkesî ku çû li dorê teştê ye
sê çarikê çûne li wê rê ye
Ela, xeber dane Zibar Begê
gotin, kes nikanê bûkê hinekê ye
erê go, dilê mino law dil dibê ye
min bi we ra digo, werin dawên law jî vê sewdê ye
erê nîfira Qemberê lawîn, law tim li pê ye
erê go, aqilê we nagîne bila bûkê me xêrli bê, bila bê hene bê ye
lê li min li min li min Ela, lo ti Xudê ye
[tembûr]

weylê weylê weylê lê
Ela, Ela, li dilê mino, lo li vê kulê ye
sibe vetê li ometê sibe vetê ku ez nemînim
li Qemberê lawîn e, Ela, Ela li dinê ye
erê malê mi danî gerê xelqê kîbar ê kê hene kin
lo ê kê sîyar kin li hespê ye
gerê dikevin tewla mala Zibar Begê ku ez nemînim
hespêd di-esîla gî bi hêceta, gî bi dapîne dikşînin ber kevrê bînekdaşê ye
eger xelqê min î kîbar lingê xu dikê rêkibê zengîyê ye
vê ra hîrînê vê dikevê vî heywanî
pişt lê bi sî û sê cîya tim dişkêye
ê lo li min li min li min Ela, law ti Xudê ye

[tembûr]

weylê weylê weylê
Ela, Ela, Qemberê lawîn go
Ela, ez ban dikim dengî min î tê ye
Ela, Ela, ya Rebbî Xudêyo ku ez nemînim xelqî min î kîbar
li xêrî ji hespê mino li ti hespa sîyar nebê ye
heger lingê xu bavê rikêbê o zengîyê ye
Ela, Ela, pişt lê bi sê cîya bişkê bikevê di-erdê ye
ê lo li min li min li min Ela, ti Xudê ye
erê weylê weylê weylê lê weylê lê weylê
Ela, xelqê min î meqbûlo
li Qember bi ketî şubhê o lo gumanê ye
go, aşîqo qurban, ti hîn xaş î law li dinyê ye
‘eceba ti dûr î ti nêzîk î Ela, Ela, ti li ku derê ye
li min li min li min
Ela, go xelq û mexlûqa, lo ji dorê min bela bin
hele nefesê min teng bû, gelo ez kê bifetisim
ev çi ‘ecêbê giran e, li dinyê ye
Ela, xelq û ‘alem ji dorê bela dibê
Ela, balê xu didê ye
Qemberê lawîn gerê piştê xu dayî diyarê hucrê lo mektebê ye
go, şevê çûnî li hêlkan û firqata bayê xerbî
ku ez rûniştibûm li ber devê taqan û penceran
gerê min balê xu didayê, bîna Qemberê lawîn tê ye
lo tev li bê ye
ê lo li min li min li min Ela, law ti Xudê ye

[tembûr]

weylê weylê weylê lê
Ela, li dilê mino lo li vê kulê ye
şêrîn Arziyê balê xu dayê Qemberî lawîn
piştê xu dayê diyarê hucrê o mektebê ye
Ela, Ela, wê çaxê go, law
ez nemînim ku li xelqo lo mexlûqo

gunehkarî ti heywana mebin
belkî heywanê dewrêşî hana mi rakê ye
erê sê-çarîkê dibezin bi sîla bi gepirê, stuyê Qember dikevin
dibê şepirtiyê sîla li ser gepirê
dikin nakin nikarin hefsarî bêrgîr ji dest bigrin
bi hefsarî bergîr ra law dixuşê ye
hetanî li cem bûkê ye
carîkê balê xu didiyê, di binê zarê ra
xelqî meqbûl balê xu didiyê
‘erebeka lêv bideq e lo ‘erebeka de-çolê ye
erê dibê sîyar be sîyar be lê sîyar be bûkê
li taliya ‘omrê minê lê li sala çûkê
te têrikê ku ez nemînim, hene dînena lê li kefneynûkê
gerê xelqê meqbûl digo, lo meqbûlo, lo devrîşo
serî min bi qurbano, dilê min hanî lo sed car hanî
gerê mi ti şandî bajarê Istenbulê ji di sala da
kanî emr û fermanê te, ji min û xu ra anî
ê lo li min li min li min Ela, law ti Xudê ye

[tembûr]

weylê weylê weylê
Ela, Ela, li dilî mino lo li vê kulê ye
xelqî meqbûl bîsmîla dikê, ku ez nemînim
lîngê xu davê rikêbê zengiyê, mengelê sîyar dibê ye
Qemberê lawîn digo, Ela, Ela
ez kê xelqê meqbûl bibim, lo mala kê ye
ez nemînim Qemberê lawîn serê bergîr dikşînê
gav ji gavê kê dikê ye
bergîr ji pa ra pê li pe’niyê dinê
bi çaqima bi çaqima goşt ji pe’niyê diweşê ye
eşqê ti tune bî, to be heram bê, Qember pê nahesê ye
ê lo li min li min li min Ela, lo ti Xudê ye

[tembûr]

weylê weylê weylê
Ela, Ela, li dilî mino, lo li vê kulê ye
erê Qemberê lawîn serê bergîrê xuo, law dikşînê ye
digînê ser Ke’niya Qerepîngarê
dibê lo xelqo, lo mexlûqo, lo ‘alemo hela go li mi nin
ez kê bi we ra bikim lo şorekê ye
gî disekinin ku ez nemînim, dinêrin li devî Qember
hele Qember kê çi şorê lo bi wan ra bikê ye
digo were were lê ka’niyê were
ken’iyê xelq û ‘alem pevdâ zanê, eva zilm û zor e
ne teqdîra, lê ne qeder e
ke’niyê Xudê kê ti kê şadeliqiyê xu îsbat kê
li pêşiyê vê xelq û ‘alemê pev da

heger ti şadeliqiyê xu îsbat nekê
ti yê li axîretê mehrûm bê ji şef'etê, lê pêxember e
hele şadeliqiyê xu li pêşiyê va xelq û 'alemê îsbat ke hele
ku ez nemînim şêrîn Arzî gerê go, malê Zibar Begê ye
lê çûkiyê şûnde da, lê a Qember e
ê lo li min li min li min Ela, law ti Xudê ye

[tembûr]

weylê weylê weylê lê
Ela, Ela, li dilê mino lo li vê kulê ye
Ela, Ela, şîqirti dikevê lo ke'niyê ye
erd û ezman vê ra law dihezê ye
dibê, ez ê şadeliqiyê xu îsbat kim
him li vê dinê him li wê dinê
erê xelqê min î kîbar ê şêrîn Arzî
a Qemberê lawîn e
ne a malê Zibar Begê ye
de were mino Qemberê lawîn
gerê dibê şepirtiyê sîla, li ser gepirê Qember tê ye
dibê, ev çitil sihirbaz e, ketî bajarê me î Qedê ye
ke'nî vê ra lo deng dikê ye
ê lo li min li min li min Ela, law ti Xudê ye

[tembûr]

weylê weylê weylê lê
Ela, Ela, dilê mino lo li vê kulê ye
erê Qemberê lawîn, ketî pêşiya bergîrê xu o dikşînê
dibê derê mala teresbavê Zibar Begê ye
xelqê min î meqbûl peya dikê ye
Ela, bervî xu diflîlê piştê xu didê dîwarê hucrê o mektebê ye
dibê hurê hurê Qemberê lawîn
Ela, Ela, êstira bi ser xu da berdidê ye
de were mino ku ez nemînim, lawê Zibar Begê ye
kekê pirê pirê mûman û meş'ela li ber sêrî li ber lînga tê ye
Ela, Ela, lo ti Xudê ye
erê wextanî lawê Zibar Begê destî xu davê xelqê meqbûl
ku ez nemînim, lo li dinyê ye
Ela, Ela, wê çaxê ar çitlemîşî bedenê dibê
dibê ava berfê, bi erdê da law dihelê ye
ê lo li min li min li min Ela, law ti Xudê ye

[tembûr]

weylê weylê weylê lê
Ela, Qemberê lawîn li ber dîwarê hicrê o lo mektebê ye
bû hurê hurê Qemberê lawîn
bi ser xu da hêstira lo berdidê ye
dibê Ela, Ela, ez kê nîfirekê bikim hus û dengî min î tê ye
'ecêba li te zor û gûca lo qehir nêye

Ela, Ela, î destî xu bavê xelqî min î kîbar ar bi bedenê kevê
ne go xêyrî nefîsî canê min
ne go xêyrî nefîsê canê mino go, ar bi bedenê kevê
bi ava berfê bi erdê da Ela, Ela, Ela, lo bihelê ye
ê lo li min li min li min Ela, law ti Xudê ye
gerê malê mi danî her sê lawê Zibar Begê
di sê law xu hebûn, her sê çûne lo li wê rê ye
gerê kekê dibin ava berfê bi erdê da law dihelê ye
gerê Zibar Begê dibê, bikin o bilezînin
Xudê kê pê li ‘ûrê min navikê min bi zikê min ra biderînin
vî arî ji malê min biderxînin
laşê her sê eslana kanî lo li min bimînin
digo, dilê min hanî law sed car hanî
Xudê kê ce’zû pîra pîrê, law go ewa kanî
Ela, nema dilê min dibêo law dil dibê ye
Zibar Begê ji pêşîya xelqê meqbûl derdikevê
gerê didê rê o derê ye
gere Ela law dil dibê ye
gerê wextanî xelqî min î kîbar bi derdikevê ji mala Zibar Begê ye
mala min danî, Qemberê lawîn bala xu dayê
ha ha şêrîn Arziyê li derê hana tê ye!
şêrîn Arzi ku ez nemînim, didê pey Qember
o Qember direvê ji pêşê ye
ê lo li min li min li min
[tembûr]
weylê weylê weylê lê
wextanî xelqê meqbûl dev ser Qemberê lawîn dinê
Qember, ji pêşê law direvê ye
erê digîne ber behrê, bîsmîla û rehman dikê
pê lê dinê û dide rê ye
xelqê min î kîbar gîşte ber pêlê behrê o lo dengizê ye
bû kûrî kûrî xelqê kîbar, lo newêrê xu lê xê ye
go, Qember aşîqo qurban, gereke ti li mi we nekî
aşîqo ez bi heyran, gereke ti li mi we nekî
tema mi jî destî xu vegirtî li ber Rebbî ‘alemê
mi go, Ela, ti pêy Qemberê lawîn ra
ti bext û miraza lê ti li min venekî
gerê Qembero ku ez bi heyran
gerê te ez di sala kirime pey hefsîkî
pişt darê, pişt şebekê
şikir elhemdulîlah ti kes nema
ji mala teres bavê lo Zibar Begê
de were dest bavê qeteb û merhebê mor guliya
bihesbîn îro min û te va rok xu dizî lo ji felekê
de li min li min li min Ela, ti Xudê ye

[tembûr]

weylê weylê weylê lê
Ela Ela xelqê meqbûl digo, Qember
aşîqo qurban ti gulî lo ez rihan im
erê ku ez qîza Hecî Mile Mehmûd im
mal mezin im, lo xanedan im
ez bi te ra rih be riho, lo can bi can im
ez ji derdî te ra îlac û melhemo, lo ez derman im
lo Qember, li heşer û mehşerê rojê qiyametê
teniya bi don im bi yaqê te da me, e ji te nabim
e ji Xudê berjêr bes ez te zanim
ê lo li min li min li min Ela, law ti Xudê ye

[tembûr]

[Guhdar]: Weylê weylê!

weylê weylê weylê lê
lê aşîqê ez bi heyran, Xudê kê megrî meqehire
lê aşîqê heyran, ku ez nemînim, Xudê kê megrî lê meqehire
bîsmîla û rehman ke, gavikê diduya lê ber min were
bila sebr û dişliqê dilî meo lê bi hevdu bidere
lê lê aşîqê, ez bi heyran, bila sebr û dişliqa dilê meo, lê bi hevdu bidere
gerê Ela Ela Ela Ela Ela, law ti Xudê ye

[tembûr]

weylê weylê weylê lê
aşîqê ez bi heyranê bi mi ra dibêne Qember
lê bi te ra dibêne şêrîn Arzi
erê bi mi ra dibêne Qemberê lawîn
bi te ra dibêne şêrîn Arzi
lê aşîqê, ez bi heyranê omîd meke
ku ez nemînim mecala min û te va nema
gerê li vê dinê ti bi kesa ra nabînê
ti bexta, ti dîlega, ti mirazî
gere xelqê meqbûl ban fikir digo, Qember
aşîqo qurban, dilê min dîn e, lo sed car dîn e
lo aşîqo qurban ku ez ku him a tî me, lo him birçî me
‘eceba ku perçeyek nan di paşilê te da
Qembero qurban qe nêdînê
gerê mala min şewitî, gerê Qemberê lawîn
wexta çûye bajarê Istenbulê
şêrîn Arziyê di nan kirine paşilê
hîn her du nanê di paşilê da ne
her du nan biderxistin
parçek nan çekir şêrîn Arziyê
yek bi xu xwar Ela, Ela
de were mino, Arziyê, kekê dike o dilezîne

a bilyan e, Qember bi şora dixîne
bejnê xelqê min î kîbaro ji telayînê rizê
wexta Qember bi şora dixînê, xu avêt o, law ket hemêzê
Ela, ar çitlemîşî bedenê her duka bû, gurê gurê vana bû
bi ava berfêk heliyan, ketine ser dengizê
li Çayê Xelatê berf û ba tê berf û ba tê
gerê Xudê nekir mirazê va her du aşîqa
Xudê bikê mirazê hazira la va cima'etê

EXTENDED ABSTRACT

This article offers a comparative examination of the different variants of the Kurdish *destan* “Arzî û Qenber,” a narrative that remains relatively neglected within Kurdish oral literature. The study focuses on two distinct sets of variants that emerged along geographically and culturally disparate lines: three prosimetric variants from Afrin (Syria) and two prose variants from the Sinjar basin (Iraq). A significant contribution of this research is the first-ever transcription and textual analysis of a unique variant performed in 2002 by the oral-poet (*kilamcî, şair, or dengbêj*) Mecîdê Hemgulî (1922-2007), accompanied by the tambour master Wehîd Xelîl. By examining how the story adapts to regional contexts, the article demonstrates the ways in which a shared narrative core is reconfigured according to local socio-religious and geographical realities, thereby forming distinct regional ecotypes. Although Arzî û Qenber shares specific thematic elements with classical Islamic romances like Leyla and Majnun, its primarily oral transmission rather than reliance on a canonical textual source has allowed it to evolve organically across community boundaries. Rooted in geographic proximity and centuries of cultural interaction, the epic constitutes a prime example of the living interplay between Kurdish and Turkish oral traditions. These variants chart the transmission history and regional inheritance within Kurdish folklore. The Afrin versions comprise an incomplete historic recording by Hesên Nazî and a text collected from his son, Evdîlqadir Hesên Nazî, by Ordîxanê Celîl and Celîlê Celîl, both renowned collectors of Kurdish oral literature. The third Afrin variant, which serves as the centerpiece of this study, is attributed to Mecîdê Hemgulî, while the final two variants originate from the Êzîdî community of Sinjar, where the story is popularly known as Qenber û Xanêlerzî. To preserve the integrity of the performance context, the Hemgulî variant was transcribed in its entirety, including spoken introductions, conversational framing, and peripheral audience interactions. This methodological approach treats the recording not merely as a fixed text, but as a performative and fluid product, highlighting the vital role of performance dynamics and audience interaction in shaping the narrative’s regional characteristics and its ongoing cultural relevance. Across all five distinct *destan* variants, the narrative shares an identical eleven-part episodic core: the childlessness of the primary families, the birth of the protagonists, their naming rituals, their childhood education, the awakening of mutual love, systemic obstruction through deception, the hero’s exile to Istanbul, his return, the recognition of the beloved at her wedding feast, her forced marriage to an aristocratic family, and the tragic death of the lovers. The narrative encapsulates regional customary laws and traditional matrimonial practices, where rites of passage surrounding birth, marriage, and death carry the weight of legal codes. The epic explicitly references traditional structures such as cradle-booking, early marriage expectations, formalized proposals through local intermediaries, pre-nuptial gift exchanges, the raising of the wedding banner, and the ritual of the bride mounting a horse from a designated stone. It also documents the practice of levirate marriage, where a widow is wedded to the deceased groom’s brother to maintain clan ties. The conflict within the plot is heavily driven by socio-economic stratification, as the orphan status and low social standing of the hero are exploited by aristocratic antagonists to deny him marital rights, reflecting the entrenched class dynamics of the regional tribal structure. The structural differences between the variants are directly informed by their performance environments and regional cultures. In Afrin, the epic maintains a highly stylized, prosimetric structure that is performed with the tambour and lasts nearly an hour, fluidly alternating between prose and melodic poetry. In contrast, the Sinjar variants have lost their poeticity and traditional mixed-form epic structure, shifting instead into shorter, simplified prose narratives that function as spoken folktales. This regional adaptation is also evident in the distribution of specific folklore motifs. The motif of the speaking fountain, which validates the fidelity of the lovers, is a prominent structural element in the Afrin versions but disappears entirely in Sinjar. Conversely, the customary taboo regarding shared foster-milk is highly functional in the Sinjar variants but completely absent in Afrin. Ultimately, Arzî û Qenber exemplifies how oral traditions transcend linguistic and cultural boundaries while preserving an active ethnographic archive of traditional practices. This study emphasizes that the fluidity of oral literature allows a single narrative core to fragment into distinct regional genres based on localized performance aesthetics and community dynamics.